



www.giyav.org.tr



NUSAFA LI TIRKIYEEYÊ LI HERÊMÊN
KU **ZAZAKÎ** LÊ TÊ AXAFTIN REWŞA
BIKARANÎNA ZIMAN Û
DAHÛRANDINA PÊŞBÎNIYAN



NUSAFÂ LI TIRKIYEYÊ LI HERÊMÊN KU ZAZAKÎ LÊ TÊ AXAFTIN REWŞA BIKARANÎNA ZIMAN Û DAHÛRANDINA PÊŞBÎNIYAN

Koma Projeyê

Berpirsiyara projeyê: Çiğdem ERTAK

Şêwirmenda Projeyê: Meryem ÖZDEMİR OK

Koordînatora Projeyê: Ceylan PALAMUT AK

Nivîsera Nûsafê: Ebru ERGİN

Xebata Qadî: Navenda Lêkolînên Qadî ya Sosyo Polîtîk

Xebata Nûsafê Lîteraturê: Serhat KILIÇ

Edîtor: Meryem ÖZDEMİR OK



Ev rapor di çarçoveya “Bernameya Alîkariya Gel” de, bi piştgiriya Yekîtiya Ewrûpa hatiye amade kirin. Berpirsyariya naverokê bi temami girêdayî “Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê” ye. Nêrînên Yekîtiya Ewrûpa û Bernameya Alîkariya Gel nîşan nade û nahebîne.

PÛŞPER 2021

NAVEROK

	DESTPÊK	3
1.	PAŞXANE	5
1.1.	Polîtîkayên Ziman ên Li Tirkîyeyê.....	6
1.2.	Peymanên Ku Tirkîye Bûye Alîgira Wan, Zimanê Dayîkê û Perwerdehî.....	7
1.3.	Kurteçîroka Zaravaya Zazakî û Xebatên Akademîk ên Têkildarî Vê Zaravayê ..	9
1.3.1.	Pêvajoya Dîrokî ya Zaravaya Zazakî.....	9
2.	Çarçove û Rêbaz	12
2.1.	Mînakdayîn	13
2.1.1.	Agahiyên Der Barê Zarokên Ku Beşdarî Xebatê Bûne De.....	13
2.2.2.	Agahiyên Der Barê Dayîk û Bavên Ku Beşdarî Xebatê Bûne De.....	14
2.2.3.	Agahiyên Der Barê Keyayên Ku Beşdarî Xebatê Bûne De.....	14
3.	ENCAM.....	15
3.1.	Li Gor Kategoriyên Cuda Dabeşkirina Encamên Ku Hatine Bidestxistin	15
3.1.1.	Zanîn û Hînbûna Zimanê Dayîkê	15
3.1.2.	Bikaranîna Zimanê Dayîkê	20
3.1.3.	Perwerdehiya Bi Zimanê Dayîkê.....	24
3.1.4.	Girîngiya Zimanê Dayîkê û Parastina Wî	27
3.2.	Nîrxandîna Encaman.....	33
3.2.1.	Zanîn û Hînkirina Zimanê Dayîkê	33
3.2.2.	Bikaranîna Zimanê Dayîkê	34
3.2.3.	Perwerdehiya Bi Zimanê Dayîkê	34
3.2.4.	Girîngiya Zimanê Dayîkê û Parastina Wî.....	35
4.	DI ŞÛNA ENCAMÊ DE	36
5.	PÊŞNIYAZ.....	39
	ÇAVKANÎ	40

Lîsteya Grafikan	
Grafik 1: Dabeşiya Zarokên Ku Beşdarî Xebatê Bûne ya Li Gor Jîngehan	13
Grafik 2: Dabeşiya Dayîk û Bavan Ku Beşdarî Xebatê Bûne ya Li Gor Navendan	14
Grafik 3: Dabeşiya Keyayên Ku Beşdarî Xebatê Bûne ya Li Gor Navendan	14
Grafik 4: Sedemên Zarokan ên Ji Bo Hilnebijartina Zimanê Xwe yê Dayîkê	27
Grafik 5: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Bî Te Axaftina Bî zimanê Dayîkê Çima Giring e	28
Grafik 6: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Bî Te Axaftina Bî zimanê Dayîkê Çima Giring e	29
Grafik 7: Bersivên Mezinan ên Ji Bo Pîrsa, Tu yê Zimanê Xwe yê Dayîkê Çawa Biparêzî	30
Grafik 8: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa, Xetereyên Li Pêşiya Hebûna Zimanê Dayîkê	30
Grafik 9: Nêrînê Dayîk û Bavan ên Der Barê Astengiyên Li Pêşiya Hinkirina Zimanê Dayîkê De	31
Grafik10: : Asta Axaftina Bî Zimanê Dayîkê ya Endamên Malbatê yên Di Teme-nê Cuda De	32

Lîsteya Tabloyan	
Tablo 1: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Çiqasî Bî Zimanê Xwe yê Dayîkê Dizanin	16
Tablo 2: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Çiqasî Bî Zimanê Xwe yê Dayîkê Dizanin	16
Tablo 3: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Tu Zimanê Xwe yê Dayîkê Ji Ku/Jî Kê û Di Kîjan Astê De Hîn Dibî	17
Tablo 4: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Tu Dixwazî Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bibî û Baştir Pê Bîaxivî	18
Tablo 5: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Tu Dixwazî Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bibî û Baştir Pê Bîaxivî	18
Tablo 6: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Ji Bo Ku Tu Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Biki Derfeta Kursê Çêbibe Tu yê Beşdar Bibiyê	19
Tablo 7: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Ji Bo Ku Tu Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Biki Derfeta Kursê Çêbibe Tu yê Beşdar Bibiyê	19
Tablo 8: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Ji Bo Ku Hûn Zarokên Xwe Hîni Zimanê Wan ê Dayîkê Bikin Hewl Didin	19
Tablo 9: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Li Malê Zêdetir Bî kîjan Zimanî Diaxivin	21
Tablo 10: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Li Malê Zêdetir Bî kîjan Zimanî Diaxivin	21
Tablo 11: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Di Hundirê Mala Xwe De Çiqasî Bî Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivin	22
Tablo 12: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Di Hundirê Mala Xwe De Çiqasî Bî Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivin	22
Tablo 13: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Tu Bî dayîk û Bavê Xwe Re Bî Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivî	23
Tablo 14: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Bî Zarokên Xwe Re Bî Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivin	23
Tablo 15: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Li Kuçeyê/Dema Hûn Dilizin Bî Piranî Bî Kîjan Zimanî Diaxivin	24
Tablo 16: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Li Kuçeyê/Di Jiyana Civakî De Hûn Bî Kîjan Zimanî Diaxivin	24
Tablo 17: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Perwerdehiya Bî Zimanê Dayîkê	25
Tablo 18: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Ji Bo Perwerdehiya Bî zimanê We yê Dayîkê Daxwazeke We Heye	25
Tablo 19: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Te Li Dibistana Xwe Zimanê Xwe yê Dayîkê Wek Dersa Hilbijartî Hilbijart an Ji Pêşniyaz Kîr	26
Tablo 20: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Giringiya Axaftina Bî Zimanê Dayîkê	28
Tablo 21: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Giringiya Axaftina Bî Zimanê Dayîkê	28
Tablo 22: Asta Axaftina Bî Zimanê Dayîkê ya Endamên Malbatê yên Di Teme-nê Cuda De	32

PÊŞGOTIN

TTirkiye ji dîrokê heta îro welatekî ku gel, çand û zimanên cuda lê jiyane, bûye. Ev dewlemendiya civakî û çandî ji ber politîka û nêzikahiyên ku tên sepanandin, nayê parastin û domandin. Li gor nûsafa UNESCO'yê li Tirkiyeyê gelek ziman bi xetereya tunebûnê re rû bi rû ne.

Li gor nûsafa UNESCO'yê zaravaya Kurdîyê Zazakî di nav zimanên neewle de cih digire. Kesên ku zimanê wan ê dayîkê Zazakî ye, vî zimanî di nav malê de, li kuçeyê û di têkiliyên xwe yên civakî de bi kar tînin û wisa didomînin. Bi Zazakiya ku qada wê ya bikaranînê pir sînoordar e, berhemên nivîskî, weşanên dîtbare û xebatên akademîk pir hindik in û di ragihandina vî zimanî ya ji bo nîfşên nû de pîrsgirêkên girîng tên jiyîn.

Ev nûsaf ji berhevkirina xebatên qadî yên li herêmên ku Zazakî tê axaftin, li navendên bajaran û qadên gundewar ên ji bo destnîşankirina amûrên ku mezin û zarokên ji komên temenên cuda ji bo asta bikaranîna ziman, hînkirin, perwerdehiya bi zimanê dayîkê, hînkirin û pêşvebirina ziman bi kar tînin û xebata literatûrê pêk hatiye. Bi xebata ku hatiye kirin, xetereya ku Zazakî pê re rû bi rû ye, hatiye destnîşankirin.

Di lêkolînên ku di çarçoveya xebata literatûrê de hatine kirin de, hatiye dîtin ku xebatên dîtbare û nivîskî yên bi Zazakî pir hindik in, zimanê ku ji rabirdûyê heta niha bi riya kevneşopîya devkî gihîştîye heta îro û hêmanên ziman ên xweser jî nehatine parastin. Di xebatên nivîskî, dîtbare, navgînên ragihandinê, xebatên akademîk û hwd. de pir hindik cih girtiye, bi piranî bi hewlên kesên ku vî zimanî bi kar tînin, sînoordar maye.

Di xebata qadî ya ku li 6 bajaran û qadên wan ên gundewar hat kirin de jî, hat dîtin, ku zaravaya Zazakî di nav malê de, li kuçeyê û di têkiliyên civakî de tê bikaranîn lê ji bo nîfşên nû her ku temen biçûk dibe, hindiktir tê bikaranîn. Dîsa hat dîtin, ên ku bi Zazakî diaxivin, girîngiyê didin parastina ziman û bala xwe didin dersên hîlbijartî, kurs, navgînên ragihandinê û hwd. Lê ev xebat jî bi awayekî domdar nayên meşandin. Di xebata literatûrê û xebata qadî de xetereyên ku Zazakî pê re rû bi rû ye, bi awayekî zelal hatin destnîşankirin û derket holê ku ji bo parastin û domandina ziman perwerdehiya bi zimanê dayîkê û bikaranîna di qada giştî de pêwîst e.

Wek weqfeke ku di qada mafên zarokan de xebatê dimeşîne, em wisa difikirin, ku hînkirina zarokan a zimanê dayîkê, perwerdehiya bi zimanê dayîkê û bi zimanê dayîkê wergirtina xizmetên giştî, mafekî bingeîn e û em bi zimanê dayîkê xebatên ji bo mafan dimeşînin. Di çarçoveya vê xebata ku em gelekî girîngiyê didinê de me dît, ku xebatên ku divê bi zaravaya Zazakî bên kirin çiqas pêwîst in û bi taybetî jî hînkirina zarokan a vê zaravayê û domandina bikaranîna wê û di dawîya nûsafê de me pêşniyazên xwe yên ji bo parastin û domandina ziman bi cih kirin. Wek GİYAVê bi zaravaya Zazakî bi taybetî ji bo zarokan em amadekirina amûrên nû didomînin. Û em dixwazin piştgiriya bidin hemû xebatên ku dê bi vî zimanî bên kirin.

Em spasiyên xwe pêşkêşî Projeya Zimanê Dayîkê û Mafên Çandî ya Bernameya Piştgiriya Mafan a ku ji bo destnîşankirina rewşa heyî ya zimanekî ku bi xetereyê re rû bi rû û amadekirina me ya amûrên cuda yên bi vî zimanî, piştgirî da me û hemû kesên ku me ji bo amadekirina nûsafê bi wan re hevkarî kir, piştgirî ji wan girt û keda xwe dan vê xebatê, dikin.

Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê

DESTPÊK

Yek ji heyînên herî zindî yên ku dijîn, ziman e û mixabin di nav heyînên herî hesas ên ku neyên bikaranîn, tune dibin de cih digire. Li ser ruyê dinyayê gelek ziman bi tunebûnê re rû bi rû ne. Li gor "Atlasa Zimanên Di Xetereyê De" (Moseley, 2012) ya ku Rêxistina Perwerdehi Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO) beriya 21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayîkê ya Cihanê weşand, li Tirkîyeyê 15 ziman di xetereyê de ne.

Di navbera ziman û ramanê de têkiliyeke girîng heye. Di pêşxistin û ragihandina ramanan de ziman di nav hêmanên bivê nevē de cih digire. Ji aliyê din ve ziman ji bo civakîbûna mirovê ku heyîneke civakî ye û bi vê taybetiya xwe ji heyînên din cuda dibe, xwedînasnamebûn, girêdana bi nasnameya xwe ve û domandina nasnameyê, afirandina çandê û domandina çanda xwe, xwediyê cihekî pir girîng e.

Ziman, behremendiyê ku mirov di merheleya pêşketinê ya destpêkê de dibin xwedî û mafekî ku bi bûyîna xwe re bi dest dixin e. Zimanê ku mirov di hawira ku tê de dibin de (bi piranî malbat) pêşiyê hîn dikin, wek zimanê wan ê dayîkê tê pejirandin. Her zaroka ku tê dinyayê, bi riya zimanê ku pê re têkilî tê danîn, dinyayê têdighîje û hîn dike û bi vê rewşê ve girêdayî, hemû raman û behremendiyên wê yên hînbûnê jî li dora zimanê dayîkê teşe digirin. (Gander û Gardiner, 2010). Piştî pêvajoyê ku bingeha hemû pêvajoyên hizrî, civakî û hwd. bi zimanê dayîkê tên danîn, rewşa bi zimanê dayîkê nedomandina perwerdehiyê ya bi zimanê xwe yê dayîkê, hêmaneke xetereya ku dikare bibe sedema zarokên ku perwerdehiya bi zimanê xwe yê dayîkê wernagirin, di hemû qadên pêşveçûnê de li paş bimînin e.

Tirkîye di pêvajoya xwe ya dîrokî ya dirêj de û îro, erdnigariyê ku gelek milletên cuda yên ku zimanê wan ê dayîkê cuda ye lê dijîn e. Lê li gor nûsafa UNESCO'yê li Tirkîyeyê gelek ziman bi xetereya tunebûnê re rû bi rû ne. Û ji vana yek jî Zazakî ye.

Armanca vê xebatê; li bajar û herêmên gundewar ên ku Zazakî lê tê axaftin, vekolandina rewşa bikaranîna ziman, zanîna ziman, ragihandina nîfşên nû, amûrên ku ji bo hînbûna ziman sûdê jê werdigirin, nêrînên axêverên zimên ên ji bo girîngî û domandina ziman e. Dîsa berhem, xebatên nivîskî û dîtbarî yên ku bi zaravaya Zazakî hatine amadekirin û hwd. hatin vekolandin û berhevkirin û me di nûsafê de cih da wan.



1. Paşxane

Li gor "Atlasa Zimanên Di Xetereyê De" ya UNESCO'yê Abazakî, Hemşînkî, Lazkî, Yewnankiya Pontûsê, Zimanên Çengeneyan, Sûretkiya ku dişibe Suryankî û Ermenkî di nav "Zimanên ku "Tegez di xetereyê de ne" cih digirin; zimanên Abhazakî, Adîge, Kabar-Çerkez û Zazakî wek zimanên neewle hatine destnîşankirin.

UNESCO ji bo ku bê fêmkirin zimanek çiqasî bi xetereyê re rû bir û ye û dabeşkirinê 9 pîvanên cuda bi kar tîne.

- Ragihandina ziman ji nîfşekê bo nîfşa din
- Hejmara kesên ku bi wî zimani diaxivin
- Rêjeya axêveran a li gor gelheya civakê
- Guherîna di qadên bikaranîna ziman de
- Berteka ziman a li hemberî qad û hawirên cuda
- Hînkirina ziman, ji bo hînkirina xwendin û nivîsandina bi wî zimani hebûna materyalên pêwîst
- Helwest û politikayên sazî û dewletan, rewşa ziman a fermî û bikaranîna ziman jî tê de
- Helwesta endamên civakê ya li hemberî zimanê xwe
- Hejmar û çawaniya belgeyên têkildarî ziman ên heyî.

Dema ku mirov li gor van pîvanên ku UNESCO'yê destnîşan kiriye, binirxîne, divê li ber çavan bê girtin, ku politikayên parastinê yên ji bo zaravaya Zazakî ya ku mijara vê lêkolînê ye, çiqas qels in.

Ji bo ku metirsiyên li pêşiya zimanên ku di xetereyê de ne yan jî di rewşa neewle de ne, bîst destnîşankirin, pêşniyazên çareseriyê yên ji bo jiyîna wan bîst pêk anîn, lêkolîn û xebatên ku dê li gor pîvanên UNESCO'yê bîst kirin, girîng in. Armanca vê xebatê ew bû, ku ji bo zaravaya Zazakî xwe bigihîne agahiyên der barê ragihandina navbera nîfşan, qada bikaranîna ziman, hejmara kesên ku pê diaxivin (ji bo mînakdayîneke biçûk) û hînkirina ziman de. Mêjer û çawaniya belgeyên heyî yên têkildarî ziman jî pîvaneke pir girîng e. Di vê çarçoveyê de der barê xebatên akademîk ên têkildarî zaravaya Zazakî de di beşa 1.2 de bi kurtasî agahî hatine dayîn.



11. Polîtîkayên Ziman ên Li Tirkîyeyê

TKu mirov bibêje li Tirkîyeyê bingeha polîtîkayên ziman destûra bingehîn a 1924'an a ku zimanê Tirkî wek zimanê fermî destnîşan dike ye, dê ne çewt be. Di meha Adarê ya heman salê de bi Zagona Yekkirina perwerdehiyê [Tevhid-i Tedrisat Kanunu] saziyên perwerdehiyê û zimanê perwerdehiyê hatine navendîkirin. Bi vê zagonê li gel girtina tekya û dergahan tevahiya dibistanên Kurdan jî hatine girtin. Dîsa tê zanîn, ku di pêvajoya sepana zagonê de li herêmen ku Kurd zêdetir lê dijîn, dibistan pir hindik hatine vekirin. "Zagona der barê pejirandin û sepandina Tîpên Tirkî yên Nû de" a bi hejmara 1353 û ya ku di mêjûya 1'ê Sermaweza 1928'an de hatiye pejirandin û wek "Şoreşa Tîpan" jî tê binavkirin, di gelek çavkaniyan de wek gava duyemîn a girîng a ku ji bo navendîkirina zimanê Tirkî hatiye avêtin, tê diyarkirin. Tê zanîn, di van pêvajoyan de li gel gavên zagonê, hiqûqê û polîtîkê en ku ji bo Tirkî belav bibe û bibe zimanê fermî hatine avêtin, hewldanên sîvil jî pêk hatine. Kampanyaya "Welatiyo Bi Tirkî Biaxe" ya ku Komeleya Xwendekarên Zankoya Hiqûqê ya Zanîngeha Stenbolê dabû destpêkirin, yek ji mînakên herî baş ên van hewldanan e. Bi vê kampanyayê di qadên giştî de hem li kesên ku ne misilman in û hem jî li kesên ku zimanê wan ê dayîkê ne Tirkî ye, axaftina bi Tirkî hatiye ferz kirin. [Coşkun, Derince û Uçarlar, 2010].

Gaveke din a ku bi armanca berbelavkirina Tirkî hatiye avêtin jî, Zagona Îskanê ya ku di sala 1934'an de hatiye derxistin e. Bi vê zagonê gelên li Tirkîyeyê wek [a] Yên ku bi Tirkî diaxivin û bi eslê xwe Tirk in, [b] Yên ku bi Tirkî naaxivin lê ji çanda Tirkî tên hesibandin û [c] Yên ku bi Tirkî naaxivin û ne ji çanda Tirkî ne, li sê koman hatine dabeş kirin. Bi taybetî koma sêyemîn a ku tê texmînkirin, behsa Kurd û Ereban dike, wek pêwîstiya zagonê bi hinceta ewlehîyê wek qada ku ji hemû cureyên niştecihbûna sîvil re girtî ye, hatiye pênas kirin. Di vê dabeşkirina mijara gotinê de polîtîka û sepanên koçberkirinê û asimilasyonê yên wek li van herêmen ku ji niştecihbûnê re hatine girtin, bicihkirina Tirkan, bicihkirina Kurdan a li herêmen ku dê bi Tirkan re bijîn, hebûn. Yek ji sepanên girîng ên ku heta salên 1950'yî jî hatine pêkanîn jî zagona paşnavan bûye. Di zagona mijara gotinê de dihat diyarkirin, ku hem kesên ne misilman û hem jî kesên misilman ên ku nav û paşnavên wan ne bi Tirkîya resen bin, divê ji xwe re nav û paşnavêkî bi Tirkîya resen hilbijêrin. [Coşkun, Derince ve Uçarlar, 2010].

Wek ku tê zanîn destûra bingehîn a 1924'an bi derbeya ku di sala 1960'î de pêk hat, hatiye guhertin û destûra bingehîn a 1960'î ketiye meriyetê. Piştî darbeya 1960'î Saziya Zimanê Tirkî bi awayekî ku piştgiriyê bide polîtîkayên berê, giştînameyên ku piştgirî didan bikaranîna Tirkîya resen, belav kiriye. Ku em tên pêvajoya derbeya sala 1980'yî, em dibînin, ku dîsa destûra bingehîn hatiye guhertin û di vê destûrê de jî behsa mijara ziman hatiye kirin. Di destûra bingehîn a sala 1982'yan de jî mîna destûrên din, zimanê Tirkî wek zimanê fermî hatiye destnîşankirin. Lê ji yên berê cudatir, di destûrê de hatiye gotin, ku ev hikum nikare bê guhertin. Dîsa di vê destûrê de vegotina "zimanê ku bi zagonê hatiye qedexekirin" hatiye bicihkirin û xalên ku dibêjin, "di saziyên perwerdehî û hîndekariyê de ji derveyî Tirkî tu ziman nikare bê hînkirin" li destûrê hatine zêdekirin [Sadoğlu, 2002].

Weke ku dê ji kurtiya ku heta niha me da jî, bê fêmkirin, polîtîka û sepanên ji bo pejirandin û berbelavkirina Tirkî û dorpêçkirina zimanên din, bi daxuyandina komarê re dest pê kirine û salên dirêj hatine domandin. Tê dîtin ku li Tirkîyeyê pêkutiyên li ser zimanan di salên 1990'î de hîna nû sist bûne. Hêmana herî girîng a ku bandor li vê sistbûnê kiriye jî, têkiliyên Tirkîyeyê û Yekîtiya Ewropayê bûne. Tê fikirin, ku li gel têkiliyên Tirkîyeyê û Yekîtiya Ewropayê têkoşîna mafan a komên cuda jî bandor li vê sistbûna polîtîkayên heyî kiriye [Sadoğlu, 2017].

1- TBMM Anayasa Komisyonu Tutanak Dergisi, 11. Toplantı, 14 Temmuz 2017 https://www.tbmm.gov.tr/develop/owa/komisyon_tutanaklari.goruntule?pTutanakId=1932

Di serdema piştî di sala 1999'an de wek berendama Yekîtiya Ewropayê pejirandina Tirkîyeyê de gelek veguherînên zagonî hatine pêkanîn. Mirov dikare hinekan ji wan wiha rêz bike:

- Zagona bi hejmara 2932'yan a ku Kurdî dikir zimanê qedexê, hatiye betalkirin.
- Di sala 2001'an de vegotina "zimanê ku bi zagonê hatiye qedexekirin" hatiye betalkirin.
- Di sala 2002'yan de di radyo û televîzyonan de weşanên bi zimanên cuda hatine serbestkirin.
- Di sala 2004'an de di TRT'yê de weşandina bernameyên radyo û televîzyonê yên bi zimanên Boşnakî, Çerkezî, Erebi, Kurdî û zaravaya Kurdî Zazakîyê dest pê kir.
- Di sala 2009'an de veguherîna mevwûatê ya ku destûr dida axaftna bi Kurdî ya girtî û hikumxwariyan pêk hat.

1.2. Peymanên Ku Tirkîye Bûye Alîgira Wan, Zimanê Dayîkê û Perwerdehî

Tê zanîn ku li Tirkîyeyê bi pêvajoya beşdarbûna Yekîtiya Ewropayê re di mijara zimanê dayîkê de gavên erênî hatine avêtin. Lê ku mirov sererastkirinên zagonî û sepanên heyi binirxîne, tê dîtin ku pêkutiyên li ser zimanê dayîkê didomin û tevgerên bi armanca yekzimanîyê jî berdewam in. Tirkîyeyê gelek peymanên mafên mirovan ên navneteweyî mor kirine û bûye dewleteke alîgira wan peymanan. Lê tê zanîn, dema ku Tirkîyeyê ev peyman mor kirine, dûreparêz danîne û beşeke girîng a van dûreparêzan têkildarî zimanê dayîkê ne. Dûreparêziyên Tirkîyeyê yên têkildarî mafê zimanê dayîkê û peymanên têkildar li jêrê hatine parvekirin.

Peymana Navneteweyî ya Mafên Siyasî û Medenî ya Neteweyên Yekbûyî²

Tirkîye di 23'yê Rezbera 2003'yan de bûye alîgira vê peymanê û ji bo vê Peymanê sê daxuyanî û dûreparêziyeke (Xal 27) wê hene.

Xal 27: Li welatên ku kêmarîyên etnîk, olî yan jî zimanî hebin, kesên ku ji wan kêmarîyan in, li gel endamên koma xwe yên wekî din, nikarin ji mafê sûdwergirtina ji çanda xwe, bawerkirina ji ola xwe û li gor wê olê kirina îbadetan an jî bikaranîna zimanê xwe bêpar bînin.

Dûreparêz: "Komara Tirkîyeyê, mafê xwe yê li gor Destûra Bingehîn a Tirkîyeyê û xal û rêbazên têkildar ên Peymana Lozanê ya bi mêjûya 24ê Tîrmeha 1924'an û Pêvekên wê, sepandina Xala 27'emîn a Peymanê diparêze."

Di xala 42'yemîn a destûra bingehîn a 1982'yan de tê gotin, ku "ji derveyî Tirkî tu zimanekî din di sazîyên perwerdehî û hindekariyê de nikare wek zimanê dayîkê yê hemwelatîyên Tirk bê hînkirin û xwendin." Destûra bingehîn di dûmahika vê beşê de gotiye, "pîvanên ji bo zimanên biyanî yên ku dê li sazîyên perwerdehî û hindekariyê bînin xwendin û dibistanên ku perwerdehî û hindekariya bi zimanên biyanî dikin, bi zagonê tînin destnîşankirin. Bîrariyên peymanên navneteweyî parastî ne" û di vê mijarê de cih daye awarteyekê. Li gor wê, di rewşên ku bi peymanên navneteweyî bikevin bin berpirsiyariyê de perwerdehî û hindekariya bi zimanên ji derveyî Tirkî dê pêkan be. Peymana ku Tirkîye di mijara zimanê perwerdehiyê de kiriye bin berpirsiyariyê, Peyman Aştîyê ya Lozanê ye. Ji ber vê yekê jî di rewşa heyî de li Tirkîyeyê ji derveyî zimanên ku di vê peymanê de hatine destnîşankirin, mafê bi zimanê komeke kêmarî ya din perwerdehiya bi zimanê dayîkê tune ye..

2- <https://insanhaklimerkezi.bilgi.edu.tr/tr/content/117-medeni-ve-siyasi-haklara-iliskin-uluslararası-sozlesme/>

3- <https://www.mevzuat.gov.tr/MevzuatMetin/15.2709.pdf>

Peymana Mafên Aborî, Civakî û Çandî ya Navneteweyî (PMACÇN)⁴

Tirkiye di 23'yê Rezbera 2003'yan de bûye alîgira vê peymanê û ji bo vê Peymanê sê daxuyanî û dûreparêziyeke [Xal 27] wê hene.

Madde 13/3: Dewletên ku aligirên vê peymanê ne, ji rêzdariya azadiya dayîk û bav an jî – di hinek rewşan de- weliyên ku bi riyên zagonî hatine destnîşankirin ên ku dixwazin ji bo zarokên xwe ji derveyî dibistanên ku saziyên dewletê vekirine, dibistanên din ên ku li gor pîvanên perwerdehiyê yên ku dewletê diyar kiriye yan jî pejirandiye, hîlbijêrin û ji serbestiya li gor bawerîya xwe perwerdekirina zarokên xwe ya olî û ehlaqî berpîrsiyar in.

Dûreparêzî: "Komara Tirkiyeyê mafê xwe yê ku dê beşên 3'yemîn û 4'emîn ên Xala 13'emîn a Peymanê di çarçoveya xalên 3'yemîn, 14'emîn û 42'yemîn ên Destûra Bingehîn a Tirkiyeyê de bisepîne, diparêze."

Destûra Bingehîn a KT'yê Xal 3: Zimanê dewleta Tirkiyeyê Tirkî ye.

Destûra Bingehîn a KT'yê 42: Ji derveyî Tirkî tu zimanekî din di saziyên perwerdehî û hindekariyê de nikare wek zimanê dayikê yê hemwelatîyên Tirk bê hinkirin û xwendin. Pîvanên ji bo zimanên biyanî yên ku dê li saziyên perwerdehî û hindekariyê bên xwendin û dibistanên ku perwerdehî û hindekariya bi zimanên biyanî dikin, bi zagonê tî destnîşankirin. Biryarên peymanên navneteweyî parastî ne.

Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (PMZNY)⁵

Tirkiye di 4'ê Avrêla 1995'an de bûye alîgira vê peymanê û ji bo sepandina peymanê dûreparêziyeke wê heye.

Dûreparêzî: "Komara Tirkiyeyê mafê xwe yê ku xalên 17'emîn, 29'emîn û 30'emîn ên Peymana Mafên Zarokan a Neteweyên Yekbûyî li gor Destûra Bingehîn a Komara Tirkiyeyê, hukim û ruhê Peymana Lozanê ya bi mêjûya 24'ê Tîrmeha 1923'an şîrove bike, diparêze."

Xal 17 (paragrafa têkildar): Ji bo ku girîniyeke taybet bidin pêdiviyên zarokên koma kêmar an jî komên xwecih, amûrên ragihandinê yên girseyî teşwîq dikin;

Xal 29 (paragrafa têkildar):

- Pêşxistina rêzdariya zarok a li hemberî dayîk û bavê wî/ê, nasnameya wî/ê ya çandî, ziman û nîrxên wê/î, nîrxên netewî yên welatê ku zarok lê dijî yan jî bi eslê xwe ji wê derê ye û şaristanîyên ji ya xwe cudatir;

- Divê zarok bi awayekî ku hişmendiya aştî, xweşbînî, wekheviya navbera zayendan û dixwazî bila ji komeke etnîk, ji neteweyekê, ji komeke olî be, dixwazî bila ji gelekî xwecih be, di nav hemû mirovan de bi gîyanê dostaniyê, di civakeke azad de, jiyînê, berpîrsiyariyê wergire, bê amadekirin;

Xal 30: Li dewletên ku kêmarîyên bi eslê xwe, ol an jî zimanê xwe cuda yan gelên xwecih hebin, zarokê/a ku ji komeke bi vî rengî yan jî ji gelekî xwecih be, nikare ji mafê ku li gel endamên koma xwe yên wekî din sûdê ji çanda xwe wergire, ji ola xwe bawer bike û pêk bîne û zimanê xwe bi kar bîne, bêpar bê hiştin.

4- <https://insanhaklarimerkezi.bilgi.edu.tr/tr/content/120-ekonomik-sosyal-ve-kulturel-haklara-iliskin-uluslararası-sozlesme/>

5- <https://www.unicef.org/turkey/%C3%A7ocuk-haklar%C4%B1na-dair-s%C3%B6zle%C5%9Fme>

Tevî ku di peymanên navneteweyî de perwerdehiya bi zimanê dayîkê wek mafekî tê pejirandin jî, li Tirkîyeyê di serî de Kurdî, bi zimanên wek Lazkî, Erebkî, Çerkezî perwerdehî bi awayekî fiîlî qedexeyê û di nav bingeheên girîng ên vê qedexeyê de ev xalên ku ji bo wan dûreparêzî hatiye danîn, hene.

Li Tirkîyeyê yek ji gavên ku ji bo sepana di perwerdehiyê de zimanê dayîkê, hatiye avêtin, ji serdema perwerdehî û hindekariyê 2012 û 2013'an ve di mufredatê de wek darsa hîlbijartî destnîşankirina darsa "Ziman û Zaravayên Ku Dijîn" e. Di nûçeya ku Bianetê di sala 2017'an de bi boneya 21'ê Reşemiyê Roja Zimanê Dayîkê belav kiriye de, tê gotin ku hejmara xwendekarên ku di serdema perwerdehî û hindekariyê ya 2013 û 2014'an de darsa zimanê dayîkê ya hîlbijartî wergirtine, 53 hezar bûye. Ev hejmar ji bo serdema perwerdehî û hindekariyê ya 2014 û 2015'an wek 85 hezar hatiye daxuyandin. Ji bo ku darsa hîlbijartî bê dayîn, divê herî kêm 10 xwendekar serî lê bidin. Ji derveyî hebûna vî şertî, divê mamosteyê/a ku bikaribe wê dersê bide jî di kadroya wê dibistanê de hebe yan jî mamosteyekî/e ku bi peymanê bixebite û bikaribe wê dersê bide, hebe. Wek ku tê dîtin, şert û mercên dayîna dersên hîlbijartî diselimînin, ku li her dibistanê dayîna darsa hîlbijartî pir zor e. Li jêrê serpêhatî û nêrînên şexsî yên du mamosteyên cuda yên têkildarî mijarê hatine dayîn.

Muzaffer Çaglayanê ku hem mamosteyê Tirkî û hem jî yê Zazakî ye, di hevpeyvîna ku bi boneya roja zimanê dayîkê pê re hatiye kirin de, rewş bi kinasî wiha vegotîye: "Ji ber ku zimanê me yê dayîkê wek darsa hîlbijartî ket nav mufredatê, ji bo min bû cihê bextewariyeke pir zêde. Her çiqas têr neke jî, ya rast ji bo mirovên ku bi sedsalan e ji ziman û dîroka xwe dûr mane, bû sedema şiyarbûn û lêgerîneke nû. Di mufredatê de cihgirtina zimanê me, hindik be jî kir ku mirovên me zêdetir bi xwe ewle bibin. Ev rewş bi taybetî ji bo kesên ku bi zaravaya Kurdîyê Zazakî diaxivîn pir girîng bû. Lewre tekane erdnîgariya ku lê dijîn Mezopotamya û Anatolya, tekane erdnîgariya ku bi zimanê wê diaxivîn, ev der e. Ger ku dê bihata axaftin diviya li vir bê axaftin. Di darsa hîlbijartî ya bi qasî du saetan de em evîna xwe ya ji bo zimanê xwe encax dikarin bi awayekî revokî bijîn." Mamosteyekî din ê ku pê re hevpeyvîn hatiye kirin û navê xwe veşartîye, dibêje, "Ger ku em beşdarî dersê nebin, ew ders tavilê tê betalkirin û di şûna wê de derseke hîlbijartî ya dinê tê bicihkirin. Ji ber tîrsa ku dê ders bê betalkirin, em newêrin tayîna xwe jî bixwazin." Bi vê vegotina xwe, bal kişandiye ser diwariya şert û mercên dayîna darsa hîlbijartî.⁸

1.3. Kurtedîroka Zaravaya Zazakî û Xebatên Akademîk ên Têkildarî Vê Zaravayê

Di vê beşê de der barê pêvajoya dîrokî ya zaravaya Zazakî û xebatên akademîk ên ku bi vê zaravayê hatine kirin de agahî tên pêşkêşkirin.

1.3.1. Pêvajoya Dîrokî ya Zaravaya Zazakî

1.3.1.1. Navgînên Çapemeniya Nivîskî

Lêkolînên zanistî yên der barê Zazakî de di sala 1856'an de dest pê kirine. Metna nivîskî ya bi Zazakî ya pêşîn di sala 1857'an de li Petersburgê ji aliyê Peter Lerch ve hatiye veşandin. Bingeha xebatên Lerch agahiyên ku ji lêşkerên dil ên bi giranî ji derdora Çewlik û Paloyê yên ku di şerê Qirimê de ketine destê hêzên Rûsî, hatine wergirtin in. Lêkolînerekî din, Friedrich Müller bi xebat û lêkolînên ku kiriye, dibêje Zazakî zimanekî ji Kurdî û Farsîyê kevntir e. Metnên din ên zaravaya

6- <https://m.bianet.org/bianet/insan-haklari/183823-yasayan-diller-ve-lehceler-dersi-ve-anadilinde-egitim-hakki>

7- <https://bianet.org/bianet/diger/220227-iki-saatlik-zazaca-dersinde-dilimizle-kacamak-bir-ask-yasiyoruz>

8- <https://bianet.org/bianet/diger/220090-kurtce-kurmanji-dersi-kapanir-korkusundan-tayin-bile-isteyemiyoruz>

Zazakî ji aliyê arkeologê Alman Albert von Le Coq ve hatine weşandin. Piştî xebatên Peter Lerch û Albert von Le Coq wek zimannasê sêyemîn O. Mann di sala 1906'an de hatiye herêmen Zazayan, li Siwêrek û Xarpêtê agahiyên der barê Zazakî de tomar kirine (Selcan, 2011).

1.3.1.2. Çavkaniyên Wêjeyî

Di sala 1899'an de ji aliyê Mela Ehmedê Xasî ve li Amedê Mewlidê Kirdkî hatiye weşandin. Ev pirtûk wek yekemîn pirtûka bi Zazakî tê pejirandin. Piştî vê pirtûkê, pirtûka duyemîn dîsa mewlûdek e û ji aliyê Osman Efendiyo Babîj ve bi navê "Bîyîşê Pêxemberî" hatiye weşandin. Her çiqas Osman Efendî ev berhem di sala 1903'yan de nivîsî be jî, pirtûk di sala 1933'yan de li Şamê ji aliyê Celadet Elî Bedîrxan ve hatiye çapkirin (Zilan, 2017).

Di salên 1947 û 1948'an de ji aliyê kurê Şêx Ensarî Şêx Muhemmedê Şêx Ensarî ve bi navê "Raro Raşt" û "Me'lumatê Dîniye" di pirtûkên din jî hatine nivîsandin. Em dikarin bibêjin, ku ji aliyê kronolojîk ve ev pirtûk, pirtûkên sêyemîn û çaremîn ên ku bi Zazakî hatine nivîsandin in. Piştî van pirtûkan salên dirêj bi zaravaya Zazakî pirtûk nehatine nivîsandin (Zilan, 2017).

Der barê berhemên ku di navbera salên 1899 û 2014'an de bi Zazakî hatine nivîsandin de Varol (2015) xebateke berfireh kiriye, di çarçoveya vê xebatê de katalogên berhemên ên gelek weşanxaneyên li Tirkîyeyê hatine vekolandin û arşîvên pirtûkxaneyên mezin hatine sehtikirin. Di encama xebatê de hejdeh cureyên berhemên ên bi Zazakî hatine destnîşankirin û kunyeya 306 berhemên hatiye pêşkêşkirin. Ji bo agahiyên kunyeyên hemû berhemên, vekolandina berhema resen dê sûdewertir be. Li gorî cureyên wan hejmara berhemên ku hatine bidestxistin li jêrê hatiye dayîn.

Rêz	Cure	Hejmar
1	Bîranîn-Serpêhatî	2
2	Antolojî	4
3	Lêkolîn/Vekolîn	6
4	Jînenîgarî	5
5	Wêjeya Zarokan	45
6	Cerebe	2
7	Destan	1
8	Rêzîman	23
9	Berhemên Olî	19
10	Folklor/Wêjeya Gelêrî	40
11	Çîrok	46
12	Pêkenî/Pêkenok/Tiştanok	6
13	Roman	16*
14	Hevpeyvîn	7
15	Gername	1
16	Ferheng	28
17	Helbest	54
18	Şano	1

*Di nav wan de berhemên wergerandî jî hene

1.3.1.3. Çavkaniyên Çapemeniya Demkî

Piştî guhertina destûra bingehîn a sala 1961'an, ji ber ku hinek qedexa rabûne, hinek astengiyên li pêşya nivîsandina bi Kurdî ji holê rabûne û si sala 1963'yan de li Stenbolê rojnameya "Roja Nêwe" hatiye weşandin. Di tekane hejmara rojnameyê ya ku hatiye weşandin de nivîseke bi Zazakî ji cih girtiye. Piştî vê rojnameyê di sala 1975'an de li Enqereyê "Riya Azadî", piştî wê di sala 1977'an de "Roja Welat" û di 1978'an de "Devrimci Demokrat Gençlik" hatine weşandin, di van weşanên demkî de hinek nûçe û berhemên wêjeya devkî yê bi Zazakî gihîştine ber destê xwendevanan [M.Malmîsanij, 2006].

Bi kovara "Tîrêj"ê ya ku di sala 1979'an de dest bi weşanê kiriye, wêjeya bi Zazakî gihîştîye asteke bilindtir, li gor weşanên berê di vê kovarê de nivîsên bi Zazakî yê wêjeyî û folklorîk zêdetir cih girtine. Kovara Tîrêjê sê hejmarên xwe yê pêşîn li Îzmîrê û hejmara xwe ya çaremîn ji jî ber derbeya 12'ê Îlonê ji mecbûrî li Swêdê weşandiye. Çîroka bi Zazakî ya pêşîn a bi navê "Engîştê Keje" ji aliyê Malmîsanij ve di kovara Tîrojê de hatiye weşandin [Can, 2018].

Piştî derbeyê xebatên Kirmanckî [Zazakî] ji mecbûrî li Ewropayê hatine domandin. Di sala 1985'an de Enstîtuya Kurdî ya Parîsê dest bi weşandina kovara "Hêvî"yê kiriye û vê kovarê cih daye gelek xebatên bi Zazakî. Di sala 1996'an de li Stokholmê Koma Xebatê ya Vate hatiye damezirandin. Di sala 1997'an de wek encama xebatên vê komê, kovara "Vate"yê dest bi weşanê kiriye. Xebatên vê kovarê îro jî hîna didomin. Piştî kovara Vateyê kovareke din a xwediyê naverokeke berfireh û temendirêj, kovara "Şewçîla"yê bûye. Kovara Şewçîlayê di sala 2011'an de li Amedê dest bi weşana xwe kiriye, piştî ku 16 hejmaran hatiye weşandin, weşana xwe bi dawî kiriye [Söylemez, 2011].

Bêdengiya ku piştî salên 1980'yî derketibû holê, piştî ku di sala 1991'an de qedexeyên hişk hinekî sist bûn, bi vê sisatbûnê re di heman salê de "Rojname", di sala 1992'yan de rojnameyên "Welat" û "Azadî" dest bi weşanê kirin. Di van rojnameyan de nivîsên bi Zazakî ji hatine weşandin [Can, 2018]. Di 15'ê Gulana 2012'an de di Cejna Zîmanê Kurdî de rojnameya heftane ya bi navê "Welat Verroj" wek pêveka Azadiya Welat dest bi weşanê kiriye. Rojnameya Welat Verroj wek heşt rûpel û bi tevahî bi Zazakî hatiye weşandin lê piştî demeke kin weşana xwe rawestandîye.

Beriya Welat Verrojê di sala 2011'an de rojnameya "NêwePel" dest bi weşanê kiriye. Ji ber ku bi tevahî bi Zazakî bû, mirov dikare bibêje di qada xwe de xebateke pêşîn e. Rojnameya NêwePel a ku di destpêkê de ji pazdeh rojan carekê derdiket, piştî demekê weşana xwe bi awayê mehane domandiye. NêwePela ku bi salan hat weşandin, di sala 2017'an de dema ku gihîştîye hejmara 100'emîn weşana xwe rawestandîye. Di 27'ê Kewçêra 2019'an de heftenameya "Xwebûn"ê dest bi weşana xwe kiriye û di wê heftenameyê de rûpelek ji bo Zazakî hatiye veqetandin. Yê ku bixwazin bi Zazakî bixwînin hîna bi awayekî periyodîk dikarin Xwebûnê bişopînin.¹²

1.3.1.4. Navgînên Ragihandinê yê Dîtbarî

Di sala 1995'an de li Londonê Med TV'ya ku kanala televîzyonê ya bi Kurdî ya pêşîn bû, dest bi weşanê kiriye. Di vê kanalê de bi awayekî sînordar bername û nûçeyên Zazakî cih girtine. Piştî Med TV'yê di kanalên wek Medya TV, Roj TV, Nuçe TV û Stêrk TV'yê yê ku ji heman kevneşopiyê ne de jî weşanên bi Zazakî hatine kirin. Ji derveyî van kanalên di kanalên wek Özgür Gün TV, Yol TV, Azadî TV û TRT Kurdîyê de jî weşana bi Zazakî hatiye kirin û didome. Li gel kanalên televîzyonê yê ku hatin hejmartin, JIYAN TV di qada çavkaniyên dîtbarî û bihîzariyê yê bi zazakî de xwediyê

9- https://tr.wikipedia.org/wiki/Mehemed_Malm%C3%A4Esanij

10- <https://www.evrensel.net/haber/29000/zazak-welat-verroj-cikti>

11- <http://www.zazaki.net/haber/newepel-ilk-kirmanca-zazaca-gazete--899.htm>

12- <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2019/12/22/xwebun-yayina-basladi>

cihekî pir taybet û girîng e. JIYAN TV'yê di 21'ê Adara 2016'an de bi naveroka xwe ya ku bi qasî ji sedî heştê bi Zazakî bû, dest bi weşanê kiriye. Lê di heman salê de, piştî vebûna xwe bi şuş mehan, bi KHK'yeke (Biryarnameya Di Hukmê Zagonê De) ku hatiye belavkirin, hatiye girtin. Di 21'ê Adara 2015'an de jî "Zarok TV"ya ku ji bo zarokan weşan dikir, dest bi weşanê kiriye û hîna jî weşana xwe didomîne. Zarok TV bernameyên xwe bi du zaravayan, bi Kurmancî û Zazakî diweşîne; temaşevan kîjan zaravayê bixwazin, dikarin hilbijêrin û bişopînin.

1.3.1.5. Xebatên Akademîk

Der barê Zazakî de hewldana akademîk a pêşîn a ku tê zanîn di sala 2009'an de di bin banê Zanîngeha Artûklîyê de vekirina Enstîtuya Ziman û Zaravayên Ku Li Tirkîyeyê Dijîn û Vekirina Bernameya Lîsansa Bilind a Bi Zazakî ye. Xebatên Kurdolojiyê yên li zanîngehên li Tirkîyeyê yên ku di bin banê Zanîngeha Artûklîyê de dest pê kirin, paşê li enstîtuyên ku di bin banê zanîngehên wek Bingol, Dicle, Zanîngeha Sala Sedemîn a Wanê û Zanîngeha Alpaslan a Mûşê hatin damezirandin de domiyane. Li gor agahiyên ku ji xebata Dahûrandina Bîbliyometrik a Tezên Lîsansa Bilind ên Ku Li Tirkîyeyê Li Ser Zazakî Hatine Amadekirin [Can,2020], hatine wergirtin di navbera salên 2013 û 2020'an de 49 tezên lîsansa bilind hatine nivîsandin. Dema ku mirov li salên weşandina tezan dinîhêre, tê dîtin, ku %44,8'ê wan di salên 2015 û 2019'an de hatine weşandin. Tê dîtin ku tez herî zêde li Zanîngeha Bingolê [%63,3] hatine amadekirin. Piraniya tezan jî [%63,3] li Beşa Zanîsta Bingehîn a Ziman û Wêjeya Zazakî hatine amadekirin. Dabeşîya mijarên tezan li jêrê hatiye nîşandan.

Rêz	Mijar	Hejmar	Rêje
	Anî-Hatîra	2	
1	Bîbliyografya	1	%2
2	Folklor	12	%24,5
3	Rêzîman	16	%32,7
4	Wêjeya Klasîk/Olî	9	%18,4
5	Wêjeya Nûjen	2	%4,1
6	Ferheng	4	%8,2
7	Dîrok	1	%2
8	Ol/Bawerî	1	%2
9	Wekî Din	3	%6,1
10	Bi Giştî	49	%100

2. Çarçove û Rêbaz

BEv lêkolîn di çarçoveya "Projeya Zimanê Dayîkê û Mafên Çandî" ya ku ji aliyê Weqfa Alîkariya Mirovî û Koçê ve di çarçoveya "Projeya Piştgiriya Rêxistinên Mafên Mirovan a Bernameya Piştgiriya Mafan" ve tê meşandin de, ji aliyê "Navenda Lêkolînên Qadî yên Sosyo Polîtîk" ve di navbera 14 û 28'ê Rezbera 2020'an de hatiye kirin. Armanca lêkolînê ew e, ku agahî û helwestên têkildarî bikaranîna zaravaya Kurdîyê ya Zazakî ya ku li ber jibîrkirinê ye, deyne holê.

Qada Lêkolînê ji 6 parêzgeh û navçeyên girêdayî van parêzgehan pêk tê. Ji bo dayik û bavan, keya û zarokan formên pirsan hatin amadekirin û hevditin rû bi rû hatin kirin. Xebata qadî ya têkildarî dayik û bav û keyayan li 12 navendên cuda, xebata qadî ya têkildarî zarokan jî li 13 navendên cuda hat meşandin. Di qada xebatê de li gel navendên parêzgeh û navçeyan bi giştî 103 gund hene.

Mînakdayîn li gor gund û bajarên ku kesên ku bi zaravaya Zazakî diaxivin, bi giranî lê dijîn; wek ku Amed navend, navçeyên Licê, Hênê, Gêl, Pîran, Pasûr, Çêrmûk û gundên wan, Çewlik navend, navçeya Dara Hênê û gundên wê, navçeya Ruhayê Siwêrek û navçeya Mûşê Gumgum û gundên wan, Dêrsim navenda bajêr û gundên wê û gundên Ezirganê bigire nav xwe, hatiye pêkanîn. Teknîka anketan a rasthatinî hatiye bikaranîn. Ji bo her zarokê/a ku beşdarî xebatê bûye destûr û erêkirina dayik û bavan û dilxwaziya zarokan hatiye wergirtin.

Encamên xebata qadî ya ku bi formên pirsan ên ku ji bo dayik û bavan, keya û zarokan cuda cuda hatibûn amadekirin, bi dahûrandinên îstatîstîkî yê guncav hatin nîrxandin û ji bo her sê koman encamên cuda hatin bidestxistin. Bi vî awayî hewl hat dayîn ku li ser bingeha yekeyên rêvebirinê yê herî biçûk taxan, berbelavbûna bikaranîna zaravaya Zazakî ku zimanê dayikê yê malbat û zarokan e, rewşa zaravaya Zazakî ya heyî û pêşbîniyên wan ên têkildarî dahatûya vê zaravayê, daxwaz û helwestên wan bîr pîvandin. Encam li gor pîrsên hevpar ên her sê koman li hinek koman hatine dabêşkirin.


2.1. Mînakdayîn

Di bin vê sernavê de dabêşiya komên beşdar a li gor navendan, jîngehan û zayendan hatiye dayîn.

2.1.1. Agahiyên Der Barê Zarokên Ku Beşdarî Xebatê Bûne De

Dema ku mirov li dabêşiya jîngehan a zarokên ku beşdarî xebatê bûne binihêre, tê dîtin, ku %74,8ê wan jî “Qadên Gundewar”, %25,2yê wan jî jî “Bajêr” beşdarî xebatê bûne. Dabêşiya beşdaran a li gor navendên ku di qada lêkolînê de cih digirin, di Grafik 1ê de hatiye parvekirin.


%45,3yê zarokên ku di koma lêkolînê de cih girtine, ji zarokên keçîn, %54,7ê wan jî ji zarokên lawîn pêk tê. %53,9ê zarokên keçîn ji qadên gundewar beşdarî xebatê bûne û ev rêje ji bo zarokên lawîn %49,21 e. Rêjeya zarokên keçîn ên ku ji navendên bajaran beşdarî xebatê bûne %46,1 û rêjeya zarokên lawîn jî %7,9 e. Zarokên ku beşdarî xebatê bûne li gorî sê koman hatine nîrxandin û rûberîhevkirin. Dema ku mirov li dabêşiya komên temen binihêre, %13ê zarokan di navbera 6 û 9 saliyê de ne, %35,2 di navbera 10 û 13 saliyê de ne û %51,8 jî di navbera 14 û 17 saliyê de ne.



Grafik 1: Dabêşiya Zarokên Ku Beşdarî Xebatê Bûne ya Li Gor Jîngehan

2.2.2. Agahiyên Der Barê Dayik û Bavên Ku Beşdarî Xebatê Bûne De

%18,4ê koma lêkolînê ji beşdarên jin, %81,6 jî ji beşdarên mêr pêk hatiye. Ku mirov li dabeşiya dayik û bavên a li gor jîngehan binêre, tê dîtin, ku %89,3'yê wan ji "Qadên gundewar", %10,7 jî ji "Bajêr" beşdarî xebatê bûne. Di xebata ku der barê ziman de hatiye kirin de, mînakdayîna ji bo têkiliya navbera zimanê dayikê û jîngehê de, ji ber ku piraniya gelheya ku bi Zazakî diaxive bi piranî li qadên gundewar dijî, mînak bi piranî ji qadên gundewar hatine hîlbijartin. Dabeşiya beşdarên a li gor jîngehên ku di qada lêkolînê de cih digirin, di Grafîk 2'yê de hatiye parvekirin.




Grafîk 2: Dabeşiya Dayik û Bavên Ku Beşdarî Xebatê Bûne ya Li Gor Navendan

2.2.3. Agahiyên Der Barê Keyayên Ku Beşdarî Xebatê Bûne De

Gava ku mirov li dema peywirê ya keyayên ku hev dîtin bi wan re hatiye kirin, dinihêre; %50,5ê wan di navbera 1 û 5 salan de, %27,2'yê wan di navbera 6 û 10 salan de, %14,5ê wan di navbera 11 û 15 salan de û %7,8ê wan ji 16 salan zêdetir keyatî kirine.

Gava ku em li grafîka xwe ya yekemîn a ku jîngehên lêkolînê tê de hatine dayîn dinihêre, %14,6ê xebatê li Dêrsimê, %10,6ê wê li Navendê, 9,7ê wê li Dara Hênê, %20,3'yê wê li Çewlikê hatiye kirin. Rêjeyên jîngehên din wek ku di Grafîk 3'yê de hatiye nîşandan e.



Grafîk 3: Dabeşiya Keyayên Ku Beşdarî Xebatê Bûne ya Li Gor Navendan

3. Encam

3.1. Li Gor Kategoriyên Cuda Dabeşkirina Encamên Ku Hatine Bidestxistin

Ev xebat bi sê komên beşdarên ên cuda yên wek zarok, dayik û bav û keyayan hatiye meşandin. Ji ber ku pirsên ji beşdarên hatine pirsîn, bi armanca hînkirina heman agahî û têgihiştinên hatine pirsîn, di şûna ku em encamên komên beşdarê cuda cuda bidin de, encamên hemû beşdarên di bin sernavên pirsên ku dişibin hev de hatine parvekirin.

Dema ku mirov pirsên ku hatine pirsîn lêbikole, tê dîtîn ku pirs 4 komên agahiyan ên cuda dinimînin. Di vê çarçoveyê de dê encamên lêkolînê jî di bin 4 sernavên cuda de bên parvekirin. Komên ku pirsên lêkolînê lê hatine dabeşkirin, li jêrê hatine dayîn:

1. Koma pirsan a ji bo zanîn û hînbûna zimanê dayîkê
2. Koma pirsan a ji bo di jiyana rojane de bikaranîna zimanê dayîkê
3. Koma pirsan a ji bo perwerdehiya zimanê dayîkê
4. Koma pirsan a ji bo girîngî û xetereya wendabûna zimanê dayîkê

3.1.1. Zanîn û Hînbûna Zimanê Dayîkê

Pirsên di koma pirsan a ji bo zanîn û hînbûna zimanê dayîkê de, li jêrê ne:

- 3.1.1.1 Tu bi zimanê xwe yê dayîkê çiqasî dizanî?
- 3.1.1.2 Tu zimanê xwe yê dayîkê ji ku/ji kê û çiqasî dikarî hîn bibî?
- 3.1.1.3 Gelo tu dixwazî zimanê xwe yê dayîkê baştir hîn bikî û pê biaxivî?
- 3.1.1.4 Ji bo hînkirina zimanê te yê dayîkê ku derfeta kursê hebûya, tu yê biçûyayê?
- 3.1.1.5 Ji bo ku zarokên we hînî zimanê xwe yê dayîkê bibin, hûn hewl didin? (Ji bo dayik û bavan)

3.1.1.1. Hûn Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayîkê Dizanin?

Ev pirs hem ji zarokan û hem jî ji dayik û bavan bi heman awayî hatiye pirsîn. Dema ku em bi çavekî danberhevî li encaman binihêre, di nav koma zarokan de hindik be jî yên ku bersiva "tu yekê jî nizanî" dane hene û tê dîtîn ku di koma dayik û bavan de bersiva "tu yekê jî nizanî" tune ye. Li gor encamên ku hatin bidestxistin, piraniya her du koman jî dikare bi zimanê xwe yê dayîkê "biaxive, têbigihîje lê nikare binivîse". Ev bersiva ku di her du koman de jî di asteke bilind de hatiye dayîn, li gor zayend, temen, jiyîna li qadên gundewar an bajêr naguhere. Ev encam nîşan dide, ku bêtir cudahiya temen, zayend û qada jiyînê, beşdar dikarin zimanê xwe yê dayîkê di asta axaftin û têgihiştinê de bi kar binin lê behremendiya wan a nivîsandinê hema bibêje qet tune ye.

Ji bo zarokên ku wek bersiva pirsê "Hûn çiqasî bi zimanê xwe yê dayîkê dizanin?" gotine, "Ez tu yekê jî nizanî." wek pirsê dûmahikê jî wan hat pirsîn ku çima nizanin. %84,6'ê beşdarên zarok



ên ku bersiva “tu yekê jî nizamim” gotin ji ber ku di malbata wan de kesekî/e ku bide hînkirin tune ye, nizanin, %15,4ê wan jî gotin ku ji bo dahatûya wan ne pêwîst e.

Ji keyayên ku koma sêyemîn a lêkolînê pêk tinin jî, pirsên têkildarî zanîn û axaftina bi zimanê dayikê ya kesên ku li tax/gund dijîn, hatin pirsîn. Wek bersiva pirsê “Yên li tax/gundê we dijîn, dikarin bi zimanê xwe yê dayikê bi axivîn”, %86,4ê keyayên ku beşdarî xebatê bûn, gotin, “erê”, %13,6ê wan jî gotin, “na”.

Di pirseke din de ji keyayan hat pirsîn, ku zarokên ku li tax/gundê we dijîn, bi zimanê xwe yê dayikê dizanin an na. %35ê beşdaran bersiva “erê”, %12,6ê wan bersiva “na” û %52,4ê wan jî “hinekî” dane.

Dema ku mirov li tevahiya pirsên ku hatine pirsîn û bersivên ku hatine wergirtin binihêre, dikare bibêje ku rewşa zanîna bi zimanê dayikê, têgihîştin û nivîsandinê jî dihundirîne; bi tenê zanîna axaftinê jî bo zanîna bi zimanê xwe yê dayikê têr nake. Hûrgiliyên encamên ku hatine bidestxistin, di Tablo 1 û Tablo 2yê de hatine parvekirin.

Hûn Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Dizanin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşiya Li Gor Temen (%)			Dabeşiya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçîn	Zarokên Lawîn	Temen	10-13 Yaş	14-17 Yaş	Kır	Kent
Bi yekê jî nizamim	3,5	6-9	Temen	10,4	2,3	2,6	1,8	8,6
Di axivim, fêm dikim û dikarim binivîsim.	7,9	10-13	Temen	2,1	3,1	12,6	8,7	5,4
Fêm dikim lê nikarim bixwînim û binivîsim	16,3	14-17	Gund	Bajar	16,9	12,6	11,2	31,2
Di axivim, fêm dikim lê nikarim binivîsim	72,4	64,10	79,2	58,3	77,7	72,3	78,3	54,8
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 1: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pirsê Hûn Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Dizanin

Hûn Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Dizanin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Yerleşim Birimine Göre Dağılım (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Di axivim, fêm dikim û dikarim binivîsim.	8,7	5,3	9,5	8,3	12,1
Fêm dikim lê nikarim bixwînim û binivîsim	1	3,5	0,4	1,1	0
Di axivim, fêm dikim lê nikarim binivîsim	90,1	91,2	90,1	90,6	87,9
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 2: Bersivên Dayik û Bavan ên Ji Bo Pirsê Hûn Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Dizanin

3.1.1.2. Tu Zimanê Xwe yê Dayîkê Ji Ku/Ji Kê û Di Kîjan Astê De Hîn Dibî?

Di bin vî sernavê pirsan de pirsan ku zimanê xwe yê dayîkê ji ku/kê û di kîjan astê de hîn dikin, hat pirsîn û ji dayîk û bavan jî pirsan ku zarokên wan zimanê xwe yê dayîkê ji ku hîn dikin, hat pirsîn. Mirov li vegotinên zarokan binihêre, tê dîtin ku zarok zimanê xwe yê dayîkê bi piranî ji malbatê hîn dikin û di pêvajoya hînkirinê de yek ji çavkaniyên girîng jî heval û cîran in. Ev agahî û agahiyên ku ji dayîk û bavan hatine wergirtin, hev digirin. %94,8ê dayîk û bavan gotin, ku zarok ji malbatê hîn dikin. Dema ku mirov li çavkaniyên hînbûna zimanê dayîkê yên din ên ku zarokan gotine, dinihêre, tê dîtin ku zarok ji bo hînkirina zimanê dayîkê amûrên wek dibistan, alavên nivîskî yan jî dîtbarî û televîzyonê bi kar nayînin. Hûrgiliyên hemû daneyan di Tablo 3yê de hatine parvekirin.

Daneyên Der Barê Çavkaniyên Hînbûna Zimanê Xwe yê Dayîkê ya Zarokan De				
	Bi Piranî	Hinekî	Hindik	Hiç
Ji malbatê	67,2	16	13,3	3,5
Ji Heval/Cîranan	32,8	14,1	23,3	29,8
Ji dibistanê	13	8,1	14,1	64,8
Ji Weşanên Nivîskî yê Wêk Pirtûk/Rojname/Kovar û hwd.	1,6	0,8	6,8	90,8
Ji Kanalên Televîzyonê yê Ku Bi Zimanê Dayîkê Weşanê Dikin	2,2	3	10,6	84,3
Bi Riya Vegotinên Wêk Muzîk/Çîrçîrok/Filmên Karton û hwd.	2,4	4,9	16,3	76,4

Tablo 3: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pirsan Tu Zimanê Xwe yê Dayîkê Ji Ku/Ji Kê û Di Kîjan Astê De Hîn Dibî

Xebatên ji bo zarokan ên heyî, materyal û bernameyên ku tên amadekirin, yek ji nîşaneyên herî girîng ên ragihandina ziman ji bo nifşên nû û domdariya ziman in. Dema ku mirov li xebat û amûrên ku bi zaravaya Zazakî ji bo zarokan hatine amadekirin dinihêre, mirov dikare bibêje, ku ev xebat bi qasî ku mirov bibêje tune ne, kêm in. Di qada hejmarî de bi giştî platformeke ku bi Kurdî rasterast ji bo zarokan naverokan amade bike tune. Di qada wêjeyê de jî ji derveyî çend pirtûkên ku çend weşanxaneyên bi Zazakî weşanê dikin û Enstîtuya Kurdî ya Amedê weşandine, ne pêkan e ku mirov behsa wêjeya zarokan a bi Zazakî bike. Mirov dikare bibêje di nav xebatên ku bi zaravaya Zazakî tên kirin de qada herî qels, xebatên ku ji bo zarokên ku zimanê wan ê dayîkê Zazakî ye, tên kirin in. Ger ku tê xwestin Zazakî bibe zimanê jiyanê û ji bo nifşên nû bê ragihandin, divê ji bo xebatên zarokan giranî bê dayîn.

3.1.1.3. Tu Dixwazî Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bibî û Baştir Pê Biaxivî?

Hem ji koma beşdar a zarokan û hem jî ji koma beşdar a dayîk û bavan heman pirs hat pirsîn. Ji derveyî koma zarokan a temenê navbera 6 û 9'an, %80'yî zêdetirî tevahiya beşdaran gotin, ku dixwazin zimanê xwe yê dayîkê hîn bikin û baştir pê biaxivin. Ji koma zarokan a temenê navbera 6 û 9'an bi tenê %52,1ê wan gotin ku dixwazin zimanê xwe yê dayîkê hîn bikin û baştir pê biaxivin. Ev cudahî bi awayekî aşkere têkildarî asta pêşketina zarokên di vê komê de hatiye nirxandin. Lewre têkiliyeke rasterast di navbera daxwaza hînkirin û axaftina zimanê dayîkê û pêzanîna girîngiya zimanê dayîkê de heye. Ev koma zarokan a ku hîna di merheleya fikirîna şênber de ye, der barê girîngiya zimanê dayîkê de têra xwe xwediyê agahî û zanîne nîn e. Ev rewşeke ku tê payîn e. Lê di xebatên ku ji bo domandina zimanê dayîkê û wendanebûna wî bîr kirin de divê ev



rewş li ber çavan bê girtin, ev pêdiviyek e. Di xebatên ku dê bi zaravaya Zazakî ji bo zarokan bîn kirin de bi taybetî beşdariya zarokên temenbiçûk, dê bike ku kêmasiya wan a agahî û pêzanîne ji holê rabe û sûdewer be.

Heman pirs ji koma keyayan bi awayê "kesên ku li tax/gundê we dijîn, ji bo ku hîni zimanê xwe yê dayîkê bibin, tu hewlan nîşan didin" hat pirsîn. %7,8ê keyayan bersiva "erê" dan, %21,4ê wan bersiva "hinekî" dan û %70,8ê wan ji bersiva "na" dan.

Hurgiliyên agahiyan di Tablo 4 û Tablo 5ê de hatine parvekirin.

Tu Dixwazî Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bibî û Baştir Pê Biaxivî?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşiya Li Gor Temen (%)			Dabeşiya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçin	Zarokên Lawîn	Temen 6-9	Temen 10-13	Temen 14-17	Gund	Bajar
Erê	86,7	83,8	89,1	52,1	89,2	93,7	90,9	86,7
Na	13,3	16,2	10,9	47,9	10,8	6,3	9,1	13,3
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 4: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pirsê Tu Dixwazî Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bibî û Baştir Pê Biaxivî

Tu Dixwazî Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bibî û Baştir Pê Biaxivî?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşiya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Erê	91,6	86	92,9	92,4	84,8
Na	8,4	14	7,1	7,6	15,2
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 5: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pirsê Tu Dixwazî Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bibî û Baştir Pê Biaxivî

3.1.14. Ji Bo Ku Tu Zimanê Xwe yê Dayîkê Hîn Bikî Derfeta Kursê Çêbibe Tu yê Beşdar Bibiyê?

Wek pirsê dawî a vê koma pirsan, ji beşdarên hat pirsîn ku derfeta hînbûna zimanê wan ê dayîkê hebe, dê biçin kursan an na. %67,2yê beşdarên zarok gotin, ku dê beşdarî kursan bibin, %66,7ê beşdarên dayîk û bav gotin ku dê beşdar bibin. Di koma beşdarên zarok de yê ku gotin em ê beşdar nebin, wek pirsê beriya viya yê ku temenê wan di navbera 6 û 9'an de bûn, ev rewş dîsa têkildarî asta pêşketina zarokan hat nixandîn. Di nav koma zarokan de rêjeya kesên ku gotin dê beşdarî kursan bibin, li gor qadên gundewar û bajaran nêzî hev e lê di koma dayîk û bavan de di vê rêjeyê de cudahî hat tespîtkirin. Ji koma dayîk û bavan ên ku li bajaran dijîyan, %87,9ê wan bersiva "erê, ez ê beşdar bibim" dan, rêjeya bersiva "erê, ez ê beşdar bibim" a beşdarên ku li taxên gundewar û giundan dijîyan %64,1 e. Mirov dikare bibêje sedema vê rewşê, derfeta beşdarên ku li taxên gundewar û giundan dijîyan a ku xwe bigihînin kursên derveyî pergala dibistanê kêm e.

Dema ku mirov li daneyên ku der barê kursên Zazakî de hatine bidestxistin, dinihêre, heta demekê ji aliyê rêxistinên civakî yê sivil, rêveberiyên xwecih û saziyên wek wan ve hindik be ji kursên Zazakî dihatin dayîn, kesên ku der barê Zazakî de xebatên wan hebûn, heta astekê bi zaravaya Zazakî bi awayekî dildar û amator kurs didan. Di sala 2004'an de cara pêşîn kursên Kurdî bi awayekî fermî hatin vekirin û ji wê mêtûyê şûn de gelek sazî û dezgehên bi zaravayên

Kurdîyê Kurmancî û Zazakî kurs dan. Van saziyan û kursên ku dihatin dayîn, bandoreke girîng li civakê kirin. Di sala 2006'an de Kurdî-Der hat damezirandin û di bin banê wê de bi salan bi awayekî rêkûpêk kursên Zazakî hatin dayîn. Lê ev komele di sala 2016'an de bi KHK'yeke (Biryarnameya Di Hukmê Zagonê De) ku hat belavkirin, hat girtin.

Ji Bo Ku Tu Zimanê Xwe yê Dayikê Hin Biki Derfeta Kursê Çêbibe Tu yê Beşdar Bibiyê?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşiya Li Gor Temen (%)			Dabeşiya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçin	Zarokên Lawîn	Temen 6-9	Temen 10-13	Temen 14-17	Gund	Bajar
Erê	67,2	73,1	62,4	43,8	69,2	71,7	67,4	67,2
Na	32,8	26,9	37,6	56,3	30,8	28,3	32,6	32,8
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 6: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pirsê Ji Bo Ku Tu Zimanê Xwe yê Dayikê Hin Biki Derfeta Kursê Çêbibe Tu yê Beşdar Bibiyê

Ji Bo Ku Tu Zimanê Xwe yê Dayikê Hin Biki Derfeta Kursê Çêbibe Tu yê Beşdar Bibiyê?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşiya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Erê	66,7	68,4	66,3	64,1	87,9
Na	33,3	31,6	33,7	35,9	12,1
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 7: Bersivên Dayik û Bavan ên Ji Bo Pirsê Ji Bo Ku Tu Zimanê Xwe yê Dayikê Hin Biki Derfeta Kursê Çêbibe Tu yê Beşdar Bibiyê

3.1.1.5. Ji Bo Ku Hûn Zarokên Xwe Hînî Zimanê Wan ê Dayikê Bikin Hewl Didin?

Ji dayik û bavan hat pirsîn, ji bo ku zarokên wan hînî zimanê xwe yê dayikê bibin, ka hewldaneke wan a taybet heye yan na. %64,1ê beşdaran gotin, ji bo ku zimanê xwe yê dayikê hînî zarokên xwe bikin hewl didin, hat dîtin, ku di vê mijarê de di navbera jin û mêran de cudahiyeke berbiçav tune ye. Têkildarî vê pirsê dema ku mirov li cudahiya navbera yên ku li taxên gundewar û gundan dijîn û yên li bajaran dijîn dinihêre, tê dîtin, ku yên li taxên gundewar û gundan dijîn zêdetir gotine, ku ew ji bo zimanê dayikê hînî zarokên xwe bikin, hewl didin. Hûrgiliyên daneyan di Tablo 8'ê de hatine dayîn.

Ji Bo Ku Hûn Zarokên Xwe Hînî Zimanê Wan ê Dayikê Bikin Hewl Didin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşiya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Erê	64,1	56,1	65,9	65,9	48,5
Na	18,4	26,3	16,7	18,8	15,2
Hinekî	17,5	17,5	17,5	15,2	36,4
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 8: Bersivên Dayik û Bavan ên Ji Bo Pirsê Ji Bo Ku Hûn Zarokên Xwe Hînî Zimanê Wan ê Dayikê Bikin Hewl Didin



3.1.2. Bikaranîna Zimanê Dayîkê

Di vê beşê de agahiyên têkildarî bikaranîna zimanê dayîkê hene. Agahiyên têkildarî pirsên wek beşdar zimanê xwe yê dayîkê li malê û li kuçe/jiyana civakî de çiqasî bi kar tînin, di nav malê de zêdetir kîjan ziman tê bikaranîn, dayîk û bav di têkiliyên bi zarokên xwe re de û zarok di têkiliyên bi dayîk û bavê xwe re de zimanê dayîkê çiqasî bi kar tînin, hatine parvekirin. Pirsên ku di koma pirsan a bikaranîna zimanê dayîkê de cih digirin li jêrê hatine dayîn:

- 3.1.2.1. Zimanê we yê dayîkê kîjan e û di nav mala xwe de hûn kîjan zimanî bi kar tînin?
- 3.1.2.2. Hûn di nav mala xwe de zimanê xwe yê dayîkê çiqasî bi kar tînin?
- 3.1.2.3. Hûn bi dayîk û bavê xwe re (ji bo zarokan) / bi zarokên xwe re (ji bo dayîk û bavan) bi zimanê xwe yê dayîkê diaxivin?
- 3.1.2.4. Li kuçeyê/di dema lîstinê de (ji bo zarokan), li kuçeyê/di jiyana civakî (ji bo dayîk û bavan) hûn bi piranî bi kîjan zimanî diaxivin?

3.1.2.1. Zimanê We yê Dayîkê Kîjan e û Di Nav Mala Xwe De Hûn Kîjan Zimanî Bi Kar Tînin?

Tevahiya zarok, keya, dayîk û bavên ku beşdarî xebatê bûn, (%100) zimanê xwe yê dayîkê wek Zazakî bi nav kirin.

Hewl hat dayîn, ku asta di nav malê de bikaranîna zimanê dayîkê bi du pirsan bê fêmkirin. Wek bersiva pirsê "Hûn di nav mala xwe de zêdetir bi kîjan zimanî diaxivin" %56,1ê zarokan û %74,8ê dayîk û bavan jî, gotin Zazakî. Ji keyayan jî hat pirsîn, li navendên ku lê peywirê dikin, di nav malê de zêdetir bi kîjan zimanî tê axaftin. %80,6ê keyayan gotin, Zazakî, %17,5ê wan gotin Tirkî û %1,9ê wan gotin Kurdî. Tevî ku tevahiya komên beşdaran zimanê xwe yê dayîkê wek Zazakî bi nav kirin jî rêjeya keya, dayîk û bavên ku gotine di nav malê de bi zimanê dayîkê diaxivin, ji rêjeya zarokan zêdetir e. Tê fikirîn ku ev cudahiya di navbera keya, dayîk û bav û zarokan de bi serwestbûna ziman, hînbûnî û bi riya perwerdehiyê zêdetir di bin bandora zimanê Tirkî de mayînê ve girêdayî ye.

Di bersivên ku ji bo vê pirsê hatine dayîn de tê dîtin, ku di navbera zarokên keçin û lawî de cudahiyeke girîng heye. %38,9ê zarokên keçin gotine, ku ew di nav mala xwe de zêdetir zaravaya Zazakî bi kar tînin, %70,3yê zarokên lawî gotine, ku ew zêdetir bi Zazakî diaxivin. Ev cudahî ji ber ku zarokên keçin li navendên bajaran zêdetir beşdarî xebatê dibin û zarokên lawî jî li qadên gundewar beşdarî xebatê dibin, derdikeve holê. Dema ku mirov binihêre, ka li gor temen di bikaranîna ziman a nav malê de cudahî heye yan tune ye, tê dîtin, ku li gor temen cudahiyeke berbiçav tune ye.

Têkildarî di nav malê de zêdetir kîjan ziman tê bikaranîn, hevrukirineke dinê jî li gor jîngehan hat kirin. Li gor encamên ku hatin bidestxistin, tê dîtin zarokên ku li taxên gundewar dijîn, di nav malê de bi giranî Zazakî (%67,4) bi kar tînin, zarokên ku li bajaran dijîn jî di nav malê de bi piranî zimanê Tirkî (%77,4) bi kar tînin. Li gor daneyên der barê dayîk û bavên ku li qadên gundewar û li bajaran dijîn de, tê dîtin ku rêjeyên bikaranîna zaravaya Zazakî nêzî hev in. Hûrgiliyên têkildarî daneyan di Tablo 9 û Tablo 10ê de hatine dayîn.

Hûn Li Malê Zêdetir Bi Kîjan Zîmanî Diaxivin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Temen (%)			Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçîn	Zarokên Lawîn	Temen 6-9	Temen 10-13	Temen 14-17	Gund	Bajar
Kirmanckî/Zazakî	56,1	38,9	70,3	43,8	61,5	55,5	67,40	22,6
Tirkî	43,9	61,1	29,7	56,3	38,5	44,5	32,6	77,4
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 9: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Li Malê Zêdetir Bi Kîjan Zîmanî Diaxivin

Hûn Li Malê Zêdetir Bi Kîjan Zîmanî Diaxivin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Kirmanckî/Zazakî	74,8	64,9	77	75,7	66,7
Tirkî	25,2	35,1	23	24,3	33,3
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 10: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Hûn Li Malê Zêdetir Bi Kîjan Zîmanî Diaxivin

3.1.2.2. Hûn Di Hundirê Mala Xwe De Çiqasî Bi Zîmanê Xwe yê Dayîkê Diaxivin?

Bi pîrseke din hat vekolandin, ku zarok, dayîk û bav di hundirê mala xwe de çiqasî bi zîmanê xwe yê dayîkê diaxivin. %40,1ê zarokan, bersiva "her tim" dan û %70,9ê dayîk û bavan jî bersiva "her tim" dan. Wek rewşeke ku dişibe pîrsa beriya viya, tê dîtin ku di navbera rêjeya axaftina bi zîmanê dayîkê ya dayîk û bavan û rêjeya zarokan de cudahî heye. Tê fikirîn, ji ber ku zarok bi awayekî çalak beşdarî pêvajoya perwerdehiyê dibin û zîmanê perwerdehiyê Tirkî ye, ev rewş wek hêmaneke bandorker dike, ku zarok di nav malê de jî axaftina bi Tirkî bidomînin.

Dema ku mirov asta bikaranîna zîmanê dayîkê ji aliyê zayendan ve binirxîne, wek pîrsa berê tê dîtin ku di navberê de cudahiyeke berbiçav heye. %50'yê zarokên lawîn ên ku beşdarî xebatê bûn, gotin, ku ew zîmanê xwe yê dayîkê di nav malê de "her tim" bi kar tînin. Ev rêje ji bo zarokên keçîn %28,1 e. Dema ku em li rewşa dayîk û bavan binihêrin, rêjeya yê ku bersiva "her tim" dane ji bo mêran %74,2 û ji bo jinan ev rêje 56,1 e.

Dema ku ji aliyê temen ve rewşa bikaranîna zîmanê dayîkê bê nirxandin, tê dîtin, ku li gor temenan cudahiyeke mezin tune ye.

Dema ku mirov rewşa bikaranîna zîmanê dayîkê li gor jîngehan binirxîne, li gor daneyan tê dîtin ku ji bo her du koman jî cudahî hene. Ji zarokên beşdar ên ku li qadên gundewar dijîn %48,6ê wan gotine, ku zîmanê xwe yê dayîkê li malê "her tim" bi kar tînin û ev rêje ji bo dayîk û bavan %74,3 e.

Hûrgiliyên daneyan di Tablo 11 û Tablo 12'ê de hatine dayîn

Hûn Di Hundirê Mala Xwe De Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Diaxivin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Temen (%)			Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçîn	Zarokên Lawîn	Temenê 6-9	Temenê 10-13	Temenê 14-17	Gund	Bajar
Her Tîm	40,1	28,1	*50	20,8	*44,6	*40,1	*48,6	*15,1
Hinek Caran	31,2	32,9	29,7	35,4	30,8	31,2	30,4	33,3
Hindik	21,1	25,7	17,3	*33,3	16,2	21,1	16,7	34,4
Hîç	7,6	13,2	3	10,4	8,5	7,6	4,3	17,2
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 11: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pirsê Hûn Di Hundirê Mala Xwe De Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Diaxivin

Hûn Di Hundirê Mala Xwe De Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Diaxivin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Her Tîm	70,9	56,1	74,2	74,3	42,40
Hinek Caran	20,1	31,6	17,5	17	45,5
Hindik	8,7	10,5	8,3	8,3	12,1
Hîç	0,3	1,8	0	0,4	0
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 12: Bersivên Dayik û Bavan ên Ji Bo Pirsê Hûn Di Hundirê Mala Xwe De Çiqasî Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Diaxivin

3.1.2.3. Hûn Bi Dayik û Bavê Xwe Re (Ji Bo Zarokan) / Bi Zarokên Xwe Re (Ji Bo Dayik û Bavan) Bi Zimanê Xwe yê Dayikê Diaxivin?

Wek bersiva pirsê, hûn bi dayik û bavê xwe re bi zimanê xwe yê dayikê diaxivin an na, %46,6'ê zarokan gotin, "erê". Ji bo pirsê hûn bi zarokên xwe re bi zimanê xwe yê dayikê diaxivin, %62,5'ê dayik û bavan bersiva "erê" dan. Li gor van daneyan her çiqas ku bê dîtîn, dayik û bavan di asteke girîng de gotine bi zarokên xwe re bi zimanê xwe yê dayikê diaxivin jî, têgihiştina zarokan a di vê mijarê de li gor dayik û bavan kêmtir e. Bi gotineke din, zarok asta axaftina bi zimanê dayikê ya dayik û bavan a di nav malê de bi wan re bi qasî dayik û bavan xwe bilind nabînin. Dema ku bersivên her du koman jî aliyê zayendê ve bîr nîrxandin, tê dîtîn ku zarokên lawîn (%55,4) bersiva "erê" dane, ev rêjê ji zarokên keçîn (35,9) zêdetir e; ji dayik û bavan, mêran (63,9) bersiva "erê" dane û ev rêjê li gor ji jinan (56,1) zêdetir e.

Dema ku mirov li gor komên temen bersivên zarokan rûberî hev bike, tê dîtîn ku rêjeya bersiva "erê" ya koma 10 û 13 salîyan û koma 14 û 17 salîyan nêzî hev e, zarokên koma 6 û 9 salîyan bi rêjeyeke hindiktir bersiva "erê" dane.

Daneyên her du koman ku ji aliyê qadên gundewar û bajêr ve bîr rûberîhevkirin, tê dîtîn ku cudahiyan bi heman rengî hene, wek bersivên pirsên din di vê pirsê de jî, bikaranîna zimanê dayikê li taxên gundewar û gundan zêdetir e. Hûrgiliyên daneyan di Tablo 13 û Tablo 14'ê de hatine dayîn.

Tu Bi dayîk û Bavê Xwe Re Bi Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivî?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Temen (%)			Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçîn	Zarokên Lawîn	Temenê 6-9	Temenê 10-13	Temenê 14-17	Gund	Bajar
Erê	46,6	35,9	*55,4	35,4	*50	*47,1	*52,9	28
Na	17,3	21,6	13,9	16,7	15,4	17,3	14,9	24,7
Hindik	36	42,5	30,7	47,9	34,6	34	32,2	47,3
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 13: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pirsê Tu Bi dayîk û Bavê Xwe Re Bi Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivî

Hûn Bi Zarokên Xwe Re Bi Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê(%)		Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Erê	62,5	56,1	63,9	64,9	42,4
Na	19,4	22,8	18,7	21	6,1
Hindik	18,1	21,1	17,5	14,1	51,5
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 14: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pirsê Hûn Bi Zarokên Xwe Re Bi Zimanê Xwe yê Dayîkê Diaxivin

3.1.2.4. Li Kuçeyê/Di Dema Lîstinê De/Di Jiyana Civakî De Hûn Bi Piranî Bi Kîjan Zimanî Diaxivin?

Bi vê pirsê, nêrînên der barê di qada giştî de bikaranîna zimanê dayîkê de hatin wergirtin. Ji her sê komên beşdar jî pirsên, li kuçeyê bi piranî bi kîjan zimanî diaxivin/ kîjan ziman tê axaftin, hat pirsîn. Ji ber ku yek ji riyên herî girîng ên civakîbûna zarokan lîstîk e, pirs ji zarokan wek di dema lîstinê de kîjan zimanî bi kar tînin û ji dayîk û bavan jî, di jiyana civakî de kîjan zimaî bi kar tînin, hatiye pirsîn. Ji keyayan jî, pirsê ew li kuçeyê/di jiyana civakî de dibin şahidê bikaranîna kîjan zimanî, hat pirsîn.

Li gor daneyên lêkolînê yên heta vê beşê, derket holê, ku ji bo her sê koman jî zimanê ku herî zêde tê bikaranîn, zimanê dayîkê ye. Lê ku mijara gotinê qada giştî be, tê dîtin ku rêjeyên têkildarî bikaranîna zimanê dayîkê diguherin. %58,8'ê zarokan gotin, li kuçeyê/di dema lîstinê de bi Tirkî diaxivin, ev rêje ji bo zarokên keçîn (%76) rêjeyeke bilindtir e.

Dema ku mirov li gor komên temen binirxîne, tê dîtin ku li kuçeyê/di dema lîstinê de koma ku herî zêde ji derveyî zimanê xwe yê dayîkê zimanekî din bi kar tîne koma zarokan a temenbiçûk e. Tê dîtin, ku %62,5'ê zarokên koma temen a navbera 6 û 9 saliyê zimanê Tirkî hildibijêrin. Cudahiya herî dramatîk jî di navbera taxên gundewar/gund û bajarên de tê dîtin. %91,4'ê zarokên ku li bajêr dijîn, gotin, ku li kuçeyê/di dema lîstinê de zimanê Tirkî bi kar tînin.

Hat dîtin, ku rêjeya bikaranîna zimanê Tirkî ya zarokan ji rêjeya bikaranîna Tirkî ya dayîk û bavan



pir zêdetir e. %73,8'ê tevahiya dayîk û bavan gotine, ku li kuçeyê/di jiyana civakî de zimanê Zazakî bi kar tînin. Li gor zayendên cuda û heta beşdarên ku li bajaran dijîn jî, zimanê ku bi piranî tê bikaranîn wek Zazakî hatiye diyarkirin. Dema ku mirov li cudahiyan navbera koman binihêre, tê dîtin ku mêr ji jinan zêdetir û yên ku li taxên gundewar/gundan dijîn, ji yên ku li bajaran dijîn zêdetir li kuçeyê/di jiyana civakî de zimanê Zazakî bi kar tînin.

Dema ku mirov li bersivên ku keyayan dane binihêre, tê dîtin %77,6'ê keyayan gotine, ku li navendên ew lê peywirê dikin, bi zimanê Zazakî tê axaftin. Ev rêje û bersivên dayîk û bavan hev digirin.

Tê fikirîn, sedema ku zarok li kuçeyê û di dema lîstinê de zimanê Tirkî ji zimanê xwe yê dayîkê zêdetir bi kar tînin, zimanê fermî yê perwerdehiyê ye. Ji ber ku zimanê fermî yê li Tirkîyê Tirkî ye û di perwerdehiyê de Tirkî tê bikaranîn, zarok li dibistanê û bi hevalên xwe yên dibistanê re bi piranî bi Tirkî diaxivin. Mirov dikare vê yekê wek hêmaneke girîng bibîne. Hûrgiliyên agahiyên di Tablo 15 û Tablo 16'ê de hatine dayîn.

Li Kuçeyê/Dema Hûn Dilîzin Bi Piranî Bi Kîjan Zimanî Diaxivin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Temen (%)			Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçîn	Zarokên Lawîn	Temen 6-9	Temen 10-13	Temen 14-17	Gund	Bajar
Kurmancî	1,1	1,2	1	0	1,5	1	1,1	1,1
Kirmanckî/Zazakî	40,1	22,8	*54,5	37,5	41,5	39,8	*51,1	7,5
Tirkî	*58,8	*76	44,6	*62,5	*56,9	*59,2	47,8	*91,4
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 15: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Li Kuçeyê/Dema Hûn Dilîzin Bi Piranî Bi Kîjan Zimanî Diaxivin

Li Kuçeyê/Di Jiyana Civakî De Hûn Bi Kîjan Zimanî Diaxivin?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Kurmancî	73,8	61,4	76,6	76,1	54,5
Kirmanckî/Zazakî	1,6	1,8	1,6	1,8	0
Tirkî	24,6	36,8	21,8	22,1	45,5
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 16: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Li Kuçeyê/Di Jiyana Civakî De Hûn Bi Kîjan Zimanî Diaxivin

3.1.3. Perwerdehiya Bi Zimanê Dayîkê

Di vê beşa xebatê de daneyên têkildarî perwerdehiya bi zimanê dayîkê hatine nirxandin. Ji zarokan pîrsa, ka dixwazin bi zimanê xwe yê dayîkê perwerdehiyê bibînin an na û nêrînên wan ên der barê li dibistanan wergirtina dersên bi zimanê wan ê dayîkê de, hat pîrsîn, bi heman awayî ji malbatan jî pîrsa, ka daxwazeke wan a ji bo perwerdehiya bi zimanê dayîkê heye yan na, hat pîrsîn. Pîrsên di bin sernavê perwerdehiya bi zimanê dayîkê de li jêrê ne.

3.1.3.1. Gelo hûn dixwazin li dibistana xwe perwerdehiya bi zimanê xwe yê dayîkê wergirin? (Ji bo zarokan)

3.1.3.2. Ji bo perwerdehiya bi zimanê dayîkê daxwazeke we heye? (Ji bo dayîk û bavan)

3.1.3.3. Te li dibistana xwe zimanê xwe yê dayîkê wek dersa hîlbijartî hîlbijart an jî pêşniyaz kir? (Ji bo zarokan)

Ji zarokên ku beşdarî xebatê bûn, pîrsa ka dixwazin li dibistana xwe bi zimanê xwe yê dayîkê perwerdehiyê wergire yan na, hat pîrsîn. %66,4ê zarokan gotin, ku dixwazin bi zimanê xwe yê dayîkê perwerdehiyê wergirin. Hat dîtin, ku rêjeya zarokên keçîn ên ku dixwazin perwerdehiya bi zimanê xwe yê dayîkê wergirin (%73,1), ji rêjeya zarokên lawîn (%60,9) zêdetir e. Dema ku mirov ji bo vê pîrsê li cudahiya navbera komên temen binihêre, tê dîtin, ku daxwaza wergirtina perwerdehiya bi zimanê dayîkê ya koma temenê navbera 6 û 9'an li gor komên temen ên dinê kêmtir e. Ev cudahî, ji ber ku zarokên koma navbera 6 û 9 saliyê ji ber temenê xwe hîna xwediyê wê zanîne nîn in, derdikeve holê. Hat dîtin, ku li gor jiyîna li taxên gundewar û gundan û bajarên, di daxwaza zarokan a perwerdehiya bi zimanê dayîkê de tu cudahî tune ye. Hûrgiliyên daneyan di Tablo 17'ê de hatine nîşandan.

Tu Dixwazî Li Dibistana Xwe Bi Zimanê Xwe yê Dayîkê Perwerde Bibî?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%) Zarokên Lawîn		Dabeşîya Li Gor Temen (%)			Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçîn	Zarokên Lawîn	Temen 6-9	Temenê 10-13	Temenê 14-17	Gund	Bajar
Erê	66,4	73,1	60,9	37,5	68,5	72,3	67,4	63,4
Na	33,6	26,9	39,1	62,5	31,5	27,7	32,6	33,6
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 17: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Perwerdehiya Bi Zimanê Dayîkê

3.1.3.2. Ji Bo Perwerdehiya Bi Zimanê Dayîkê Daxwazên We Hene?

Têkildarî daxwaz/xwesteka ji bo perwerdehiya bi zimanê dayîkê ji dayîk û bavan hat pîrsîn, ku daxwazeke wan a bi wî rengî heye yan tune ye. %73,5'ê beşdaran gotin, ku daxwazeke wan a wisa heye û rêjeya bersivên jin û mêran nêzî hev e. Di bersivên dayîk û bavan ên ji bo daxwaza perwerdehiya bi zimanê dayîkê de li gor jiyîna li taxên gundewar û gundan û bajarên cudahiyeke berbiçav nehat dîtin. Hûrgiliyên daneyan di Tablo 18'ê de hatine dayîn.

Ji Bo Perwerdehiya Bi zimanê We yê Dayîkê Daxwazeke We Heye?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Erê	73,5	73,7	73,4	71,7	87,9
Na	26,5	26,3	26,6	28,3	12,1
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100

Tablo 18: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pîrsa Ji Bo Perwerdehiya Bi zimanê We yê Dayîkê Daxwazeke We Heye



3.1.3.3. Te Li Dibistana Xwe Zimanê Xwe yê Dayîkê Wek Dersa Hilbijartî Hilbijart an Ji Pêşniyaz Kir?

Ji zarokan hat pirsîn, ku li dibistanên xwe zimanê xwe yê dayîkê wek dersa hilbijartî hilbijartine yan hilnebijartine an jî di rewşên ku zimanê wan ê dayîkê li dibistanê wek dersa hilbijartî nehatiye diyarkirin de ev ders pêşniyaz kirine yan na, hat pirsîn. Dema ku bersivên zarokan tîn vekolandin, tê dîtin, ku %73,2'yê zarokan li dibistanê wek dersa hilbijartî zimanê xwe yê dayîkê hilnebijartine yan jî pêşniyaz nekirine. Di mijara wek dersa hilbijartî hilbijartin an jî pêşniyazkirina zimanê dayîkê de di navbera zarokên keçî û lawî de cudahiyeke nehat dîtin. Dema ku bersivên hatine dayîn, ji aliyê komên temen ve bîr vekolandin, tê dîtin ku di hemû komên temen de piraniya zarokan zimanê xwe yê dayîkê wek dersa hilbijartî hilnebijartine yan jî pêşniyaz nekirine. Li gel vê yekê tê dîtin, ku rêjeya zarokên di koma temenê navbera 6 û 9'an de [%89,6] li gor komên temen ên dinê zêdetir e. Dema ku mirov binîhêre li gor jîngehan cudahiyeke heye yan tune ye, tê dîtin ku rêjeya zarokên ku li bajêr dijîn a hilnebijartin an jî pêşniyaznekirina dersa hilbijartî ya zimanê dayîkê, zêdetir e. Hûrgiliyên daneyan di Tablo 19'ê de hatine dayîn.


Te Li Dibistana Xwe Zimanê Xwe yê Dayîkê Wek Dersa Hilbijartî Hilbijart an Ji Pêşniyaz Kir?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşiya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşiya Li Gor Temen (%)			Dabeşiya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçî	Zarokên Lawî	Temen	10-13 Yaş	14-17 Yaş	Kir	Kent
Erê	26,8	6-9	Temen	10,4	24,6	32,5	30,8	15,1
Na	73,2	10-13	Temen	89,6	75,4	67,5	69,2	84,9
Bi Giştî	%100	14-17	Gund	Bajar	%100	%100	%100	%100

Tablo 19: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pirsê Te Li Dibistana Xwe Zimanê Xwe yê Dayîkê Wek Dersa Hilbijartî Hilbijart an Ji Pêşniyaz Kir

Ji zarokên ku wek bersiva pirsê, te zimanê xwe yê dayîkê wek dersa hilbijartî hilbijart an jî pêşniyaz kir, gotin, "na", sedem hat pirsîn û %48,4'ê zarokan gotin, ku vebijêrkeke bi vî rengî pêşkêşî wan nekirine. %30,8'ê zarokên ku beşdarî xebatê bûn, pirsê çima, bê bersiv hiştin %9,7'ê wan gotine, ku pêdivî nedîtine û %6,1'ê wan jî bersiva "nizanim" dan. Bersivên din ên ku rêjeyeke kêmkirî ji wîhan in: Şert û merc ne guncav bûn (%2,5), ez girîng nabînim (%0,7), ez ji zimanê Tirkî hez dikim (%0,7), xêra wê tune (%0,7) û naxwazim hîn bibim (%0,4).

Tê dîtin, ku daneyên hatine bidestxistin, bi sepanên têkildarî perwerdehiya bi zimanê dayîkê re lihevkiirî ne. Di sala 2012'an de bi biryara Lijneya Wezîran, li dibistanên girêdayî Wezareta Perwerdehiya Neteweyî dersên hilbijartî yê bi zaravayên Kurdîyê Kurmancî û Zazakî dest pê kirin. Di sala 2014'an de bi navê Ferzad Kemanger dibistaneke xweser a ku perwerdehiya bi Kurdî dida, hat vekirin. Tevî ku di bin banê dibistanê de poleke ku bi Zazakî perwerde dida, tune bû jî, li polên ku bi Kurmanciya zaravaya Kurdîyê ders dihat dayîn, Zazakî wek derseke bîngehîn hatiye dayîn. Mirov dikare ji bo Dibistana Ferzad Kemanger bibêje li Tirkîyeyê dibistana ku cara pêşîn bi Kurdî ders daye ye. Ev dibistan di sala 2016'an de hatiye girtin. Kêmbûna derfetên heyî, bi awayekî neyînî bandor li beşdariya zarokan a dersên hilbijartî yê bi zimanê dayîkê kiriyê.

Hûrgiliyên daneyan di Grafîk 4'ê de hatine parvekirin.



Grafîk 4: Sedemên Zarokan ên Ji Bo Hilnebijartina Zimanê Xwe yê Dayîkê

3.1.4. Girîngiya Zimanê Dayîkê û Parastina Wî

Armanca vê beşa xebatê ew e, ku nêrînên zarokan û dayîk û bavên wan ên der barê girîngî û parastina zimanê dayîkê de derxe holê. Pirsên ku di çarçoveya vê koma pirsan de ji beşdaran hatine pirsîn, li jêrê ne:

- 3.1.4.1. Bi te axaftina bi zimanê dayîkê çiqas girîng e?
- 3.1.4.2. Bi te axaftina bi zimanê dayîkê çima girîng e?
- 3.1.4.3. Bi te tu yê çawa bikaribî zimanê xwe yê dayîkê biparêzî? (Ji bo zarokan)
- 3.1.4.4. Bi te xetereya herî mezin a li pêşiya hebûna zimanê te yê dayîkê çi ye? (Ji bo dayîk û bavan)
- 3.1.4.5. Bi we astengiya herî mezin a li pêşiya hînîkirin û axaftina bi zimanê dayîkê ya zarokên we çi ye? (Ji bo dayîk û bavan)

3.1.4.1. Axaftina Bi Zimanê Dayîkê Bi Te Çiqas Girîng e?

Ji zarok û dayîk û bavan hat pirsîn, ku zimanê dayîkê çiqas girîng e û di çar astên cuda de bersiv hatin wergirtin. Dema ku mirov li bersivên zarokan binihêre, tê dîtîn, ku ji derveyî zarokên temenê navbera 14 û 17 saliyê, ji %50'yê zarokan hindiktir bersiva, "pir girîng e" dane. Dema ku mirov bersivên "pir girîng" û "girîng" li ser hev binirxîne, dertê holê ku 79,4'ê zarokan girîng dibînin. Ji zarokan cudatir, tê dîtîn ku %77,7'ê dayîk û bavan difikirin, ku axaftina bi zimanê dayîkê "pir girîng" e. Yek ji daneyên ku hatine bidestxistin jî ew e, ku hem ji bo zarokan û hem jî ji bo dayîk û bavan ji aliyê zayendê ve cudahiyeke watedar tune ye. Hûrgiliyên agahiyan di Tablo 20 û Tablo 21'ê de hatine dayîn.

Axaftina Bi Zimanê Dayîkê Bi Te Çiqas Gîrîng e?	Tevahiya Beşdaran (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Temen (%)			Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Zarokên Keçîn	Zarokên Lawîn	Temen 6-9	Temen 10-13	Temen 14-17	Gund	Bajar
Ne Gîrîng e	2,7	1,8	3,5	2,1	3,1	2,6	3,6	0
Fikreke Min Tune	17,9	16,8	18,8	47,9	20,8	8,4	15,2	25,8
Gîrîng e	31,4	34,1	29,2	39,6	30,8	29,8	28,3	40,9
Pir Gîrîng e	48	47,3	*48,5	10,4	*45,4	*59,2	*52,9	33,3
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100	%100


Tablo 20: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Gîrîngiya Axaftina Bi Zimanê Dayîkê

Axaftina Bi Zimanê Dayîkê Bi Te Çiqas Gîrîng e?	Toplam Katılımcı (%)	Dabeşîya Li Gor Zayendê (%)		Dabeşîya Li Gor Jîngehan (%)	
		Jin	Mêr	Gund	Bajar
Pir Gîrîng e	77,7	75,4	78,2	79,3	63,6
Gîrîng e	20,1	21,1	19,8	18,5	33,3
Ne Gîrîng e	0,6	3,5	0	0,8	0
Fikreke Min Tune	1,6	0	2	1,4	3
Bi Giştî	%100	%100	%100	%100	%100


Tablo 21: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Gîrîngiya Axaftina Bi Zimanê Dayîkê

3.1.4.2. Bi Te Axaftina Bi zimanê Dayîkê Çima Gîrîng e?

Wek dûmahîka pîrsa, axaftina bi zimanê dayîkê çiqas gîrîng e, pîrsa ku çima gîrîng e, ji zarok, dayîk û bavan hat pîrsîn. %42,3'yê zarokan û %40,1'ê dayîk û bavan bersiva, "ji ber ku zimanê me yê dayîkê ye" dan, %23'yan ji gotine, ku fikreke wan a der barê 'çima gîrîng e' de tune. Di nav bersivên ku dayîk û bavan dane de vegotinên wek zimanê wan ê dayîkê çanda wan e (%14,2) û dîroka wan e (12) pir derbas dibin. Rêjeyên têkildarî hemû bersivan di Grafîk 5 û Grafîk 6'ê de hatine dayîn.



Grafîk 5: Bersivên Zarokan ên Ji Bo Pîrsa Bi Te Axaftina Bi zimanê Dayîkê Çima Gîrîng e




Grafîk 6: Bersivên Dayîk û Bavan ên Ji Bo Pirsê Bi Te Axaftina Bi zimanê Dayîkê Çima Giring e

3.1.4.3. Bi Te Tu yê Çawa Bikaribî Zimanê Xwe yê Dayîkê Biparêzî?

Ev pirs, pirsê ku bi tenê ji zarokan hatiye pirsin e. Di bersivên ku zarokan ji bo pirsê, dê zimanê dayîkê çawa bê parastin de tê dîtin, ku piraniya zarokan gotine, berbelavbûna axaftinê. Rêjeyeke girîng a zarokan [%26,8] gotin ku di vê mijarê de fikreke wan tune ye. Ji bo parastina zimanê dayîkê hejmareke hindik zarokan pêşniyazên wekî din kirine û di nav wan pêşniyazan de jî vegotinên wek perwerdehiya bi zimanê dayîkê, xwedîderketina li zimanê dayîkê, bi zarokan danhînkirina dayîk û bavan, cih digirin.

Rêjeya bersivên tevahiya beşdaran û rêjeya li gor zayendan hev digirin. Ku bersivên zarokên keçin û zrokên lawîn cuda cxuda bînin nîrxandin, tê dîtin, %40,7ê zarokên keçin û %39,1ê zarokên lawîn, bersiva berbelavbûna axaftina bi zimanê dayîkê, dane. Dîsa beşeke girîng a zarokên keçin [21,6] û zarokên lawîn [%31,2] gotine, ku der barê mijarê de fikreke wan tune ye. Dema ku tîkildarî vê pirsê li cudahiya navbera komên temen bînin nîrêtin, %62,5ê zarokên temenê navbera 6 û 9 saliyê gotine, der barê mijarê de "fikreke min tune ye". Ku taybetiyên pêşketina asta wan a pêzanînê li ber çavan bînin girtin, kêmîbûna agahiyên û komê yê der barê zimanê dayîkê de û nekarîna vegotina fikra xwe, wek rewşê ku tê payîn, hat nîrxandin.


Li gel vê yekê %43,1ê zarokên temenê navbera 10 û 13 saliyê û 39,8ê zarokên temenê navbera 14 û 17 saliyê bi daneyên din re lihevkarî bersiva, berbelavbûna axaftina bi zimanê dayîkê, dane. Ku daneyên hatine bidestxistin, bînin nîrxandin, dîsa tê dîtin, ku ji aliyê zarokên ku li taxên gundewar [%39,1] û li bajaran [41,9] dijîn, herî zêde bersiva berbelavbûna axaftina bi zimanê dayîkê hatiye dayîn. Hûrgiliyên agahiyan di Grafîk 7ê de hatine dayîn. .



Grafîk 7: Bersivên Mezinan ên Ji Bo Pirsê, Tu yê Zimanê Xwe yê Dayikê Çawa Biparêzî

3.1.4.4. Bi Te Xetereya Herî Mezin a Li Pêşîya Hebûna Zimanê Te yê Dayikê Çi ye?

Ev pirs ji dayik û bavan hatiye pirsîn. Ku mirov li bersivên dayik û bavan binihêre, tê dîtin, ku %27,5ê wan “axaftina bi Tirkî” wek xetere nîrxandine, %23’yê wan jî gotine, ku têkildarî tunebûna zimanê dayikê pîrsgirêkek tune ye. Di nav bersivên ku herî zêde hatine dayîn de vebijêrkên “nebûna perwerdehiya bi zimanê dayikê” (%12,3) û “axaftina zarokan a her tim bi Tirkî” (%9,7) cih girtine. Hûrgiliyên tevahiya bersivan di Grafîk 8’ê de hatine dayîn.




Grafîk 8: Bersivên Dayik û Bavan ên Ji Bo Pirsê, Xetereyên Li Pêşîya Hebûna Zimanê Dayikê

3.14.5. Bi We Astengiya Herî Mezin a Li Pêşiya Hînkirin û Axaftina Bi Zimanê Dayikê ya Zarokên We Çi ye?

Ev pirs bi tenê ji dayik û bavan hat pirsîn. Ku li bersivên beşdaran bê nihêrtin, encama ku %29,8ê wan wek xetereya herî mezin "nebûna perwerdehiya bi zimanê dayikê" dibînin, dertê holê. Yek ji xetereyên ku beşdaran bi rêjeyeke zêde anîne ziman jî, "neaxaftina malbatan a bi zimanê dayikê ya bi zarokên xwe re" [%18,1] ye. Bi awayekî ku dişibe pirsra beriya viya %23yê beşdaran gotine, ku di vê mijarê de pirsgirêk/xetereyê nabînin. Têvahiya bersivan di Grafîk 9ê de hatine dayîn.

Pirsra dawîn a ku der barê zarokên wan de ji dayik û bavan hat pirsîn, pirsra ku zarokên wan zimanê xwe yê dayikê ji ku hîn dibin, bû. %94,8ê dayik û bavan gotin, ku ji malbatê hîn dikin, %5,2yê wan jî gotin, ku zarokên wan nikarin zimanê xwe yê dayikê hîn bikin.



Grafîk 9: Nêrînê Dayik û Bavan ên Der Barê Astengiyên Li Pêşiya Hînkirina Zimanê Dayikê De

Herî dawiyê ji zarokan hat pirsîn, ku endamên malbatê yên cuda di nav malê de çiqasî bi zimanê xwe yê dayikê diaxivin. Ji wan hat xwestin, ku vê pirsê ji bo dayik û bavê xwe û endamên malbatê yên di temenê cuda de bibersivînin. Di vê çarçoveyê de me xwest, ku em der barê asta axaftina bi zimanê dayikê ya dayik û bavan û zarokên ji neh (9) komên cuda yên temen de agahiyan wergerin. Pirs, ji zarokan bi qalibên wek "Dayîka we di nav malê de çiqasî bi zimanê dayikê diaxive?", "Di nav malê de kesên di temenê navbera ... de çiqasî bi zimanê xwe yê dayikê diaxivin" hatin pirsîn. Li gor bersivên ku zarokan dane, asta endamên malbatê ya axaftina bi zimanê xwe yê dayikê yên ji 11 komên temen ên cuda (li gor çavdêriyên zarokan) di Tablo 22yê de hatiye parvekirin




Li Gor Çavdêriya Zarokan Asta Axaftina Bi Zimanê Dayîkê ya Endamên Malbatê yê Di Temenê Cuda De [%]

Endamên Malbatê	Pir Diaxivin	Car Caran Diaxivin	Hindik Diaxivin	Hiç Naaxivin
Dayîk	62,6	25,5	8,4	3,5
Bav	61,8	27,1	8,4	2,7
Temenê 0-5	34,5	10,6	20	34,9
Temenê 6-11	35,8	11,8	20,1	32,3
Temenê 12-17	41	12,9	19	27,1
Temenê 18-24	47,4	11,5	16,3	24,9
Temenê 25-34	61,7	5	11,7	21,7
Temenê 35-44	72,7	9,1		18,2
Temenê 45-54	77,8	5,6	11,1	5,6
Temenê 55-64	83,9	9,7	3,2	3,2
Ji 65'an Berjortir	80,5	12,2	2,4	4,9

Tablo 22: Asta Axaftina Bi Zimanê Dayîkê ya Endamên Malbatê yê Di Temenê Cuda De

Wek ku tê dîtin, her ku temenê kesên mezin dibe, axaftina wan a bi zimanê dayîkê jî zêdetir dibe. Ji bo şopandina guherînên dramatîk ên di zêdebûnê de, di Grafîk 10'ê de grafîka meylê hatiye parvekirin.



Grafik 10: : Asta Axaftina Bi Zimanê Dayîkê ya Endamên Malbatê yê Di Temenê Cuda De

3.2. Nirxandina Encaman

Di vê beşê de nirxandineke pûxteyî ya daneyên ku hatine bidestxistin, cih digire. Wek di ragihandina daneyan de, di nirxandinê de jî li gor çar komên daneyan ên cuda nirxandin hat kirin.

3.2.1. Zanîn û Hînbûna Zimanê Dayîkê

Ku daneyên di beşa têkildarî zanîn û hînkirina zimanê dayîkê de bîr nirxandin, tê dîtin, ku piraniya beşdaran dikarin bi zimanê xwe yê dayîkê bi axivîn, têbigihîjin lê nikarin pê binivîsin. Ev dane wek rewşeke rasterast têkildarî nebûna perwerdehiya bi zimanê dayîkê, hat nirxandin. Behremendiya axaftina bi zimanekî û têgihîştina wî, bi bikaranîna di nav jiyana rojane de pêkan e. Zarok zimanê xwe yê dayîkê jî mirovên ku di nav malê de pêşiyê têkiliyê bi wan re datînin û bêyî ku tu perwerdehiyê wergirin, hîn dibin. Axaftin û têgihîştin, ku pirsgerêkeke bingeîn tune be, di nav behremendiyên ku takekes bê perwerdehî dikarin bibin xwedî de cih digirin. Lê ji bo behremendiyên xwendin û nivîsandinê perwerdehiyeke dibistanî divê û dema ku mirov lê dinihêre, li tevahiya cîhanê di pergala perwerdehiyê de behremendiya ku pêşiyê didin zarokan, behremendiya xwendin û nivîsandinê ye. Li Tirkiyeyê zarokên ku zimanê wan ê dayîkê zimanekî jî Tirkî cudatir e, dema ku dest bi dibistanê dikin, zimanekî duyemîn dikeve nav jiyana wan û tê payîn, ku bi wî zimanî bibin xwediyê behremendiya xwendin û nivîsandinê. Lê ji bo zarokên ku 6 salên jiyana xwe yê pêşîn bi danîna têkiliyên bi zimanekî jî Tirkî cudatir derbas dikin, hînkirina zimanê duyemîn diwartir dibe, behremendiya wan a bikaranîna zimanê xwe yê dayîkê ya di qada xwendin û nivîsandinê de jî bi pêş nakeve. Ev rewş pêvajoya hînbûnê ya zarokên duzimanî bi neyînî bandor dike û ji bo serwestbûna di zimanê xwe yê dayîkê de jî dibe asteng.

Daneyên ku ji bersiva pirsê ku beşdar, bi taybetî jî zarok zimanê xwe yê dayîkê jî ku hîn dikin, hatine wergirtin, lihevkiirî ne û nîşan didin, ku zimanê dayîkê jî malbatê tê hînkirin. Ku li gor polîtîkayên ziman ên li Tirkiyeyê bê nirxandin, hînkirina zarokan a zimanê xwe yê dayîkê ya bi piranî jî malbatê, rewşeke ku tê payîn e. Li Tirkiyeyê wek ku li dibistanan pergala perwerdehiya bi zimanê dayîkê tune ye, derfeta ku zarok ji derveyî malbatê xwe bigihînin çavkaniyên baştir hînbûna zimanê dayîkê, bi qasî ku mirov bibêje tune ne, hindik in. Ku li polîtîka û sepanên heyî yê li Tirkiyeyê bê nihêrtin, mirov dikare bibêje ji derveyî Zarok TVyê kanaleke televîzyonê ya ku bi zaravaya Zazakî weşanê bike, tune ye, bi vê zaravayê alav û amûrên nivîskî û dîtbarî nayên hilberandin û ji bo ku ev zarava ji derveyî pergala dibistanê bê hînkirin, tu pergal nehatiye saz kirin. Li gel vê yekê jî ji daneyan tê fêmkirin, ku %80'yê beşdaran xwediyê daxwaz û motîvasyona hînbûn û axaftina baştir a zimanê xwe yê dayîkê ne. Ji bo ku ev daxwaz û motîvasyon bê nîşandan, ji beşdaran pirsê, ku derfeta kursan hebe dê beşdarî kursan bibin an na, hat pirsîn û agahiya ku %70'yê wan dixwazin beşdar bibin, hat bidestxistin. Di mijara beşdarbûna kursan de rêjeya kesên ku li bajaran dijîn zêdetir e. Ev jî agahiyeke din a ku hat bidestxistin e. Tê fikirîn, ku ev cudahiya di navbera qadên gundewar û navendên bajaran de ji ber ku yê li bajaran dijîn, di mijara axaftina bi zimanê dayîkê de xwedî dezavantaj in û li bajaran pêkanbûna bidestxistina derfeta kursan, derdikeve holê.



3.2.2. Bikaranîna Zimanê Dayîkê

Dema ku mirov li agahiyên ku di beşa lêkolînê ya têkildarî bikaranîna zimanê dayîkê de hatine bidestxistin, dinihêre, agahiya ku pêşiyê tê dîtin, tevahiya beşdarên zimanê xwe yê dayîkê wek Zazakî bi nav kirine. Beşdarên ku zimanê xwe yê dayîkê wek zimanekî din diyar kiribin tune ne. Di vê beşê de pirsê, di nav malê de zêdetir bi kîjan zimanî tê axaftin û pirsê di nav malê de bi zimanê dayîkê çiqas tê axaftin, hatin pirsîn. Bi van pirsan hewl hat dayîn, ku asta axaftina zimanê dayîkê ya di nav malê de bê fêmkirin. Dema ku dane tîn vekolandin, tê dîtin ku dayîk û bavan ji zarokan zêdetir bersiva Zazakî dane. Di heman demê de tê dîtin, ku zarokên lawîn di nav malê de ji zarokên keçin zêdetir Zazakî bi kar tînin. Tê fikirîn, sedema vê cudahiya di navbera zarokan de ew e, ku zarokên lawîn zêdetir ji qadên gundewar û zarokên keçin ji navendên bajaran beşdar bûne.

Dema ku li asta axaftina bi zimanê dayîkê ya di nav malê de tê nihêrtin, tê dîtin, ku dayîk û bav ji zarokan zêdetir bi zimanê dayîkê têkiliyan datînin. Ji ber ku zarok bi awayekî çalak beşdarî pergala perwerdehiyê dibin û zimanê perwerdehiyê jî Tirkî ye, wek hêmaneke ku ihtimala zarok di nav malê de ji axaftina bi Tirkî didomînin, zêde dike, tê fikirîn. Tê dîtin, ku nêrînen der barê bi zimanê dayîkê axaftina dayîk û bavan a bi zarokên xwe re û axaftina zarokan a bi dayîk û bavên xwe re de cuda ne. Her çiqas daneyên ku hatine bidestxistin nîşan didin, ku dayîk û bav zêdetir bi zimanê xwe yê dayîkê diaxivin ji, têgihiştina zarokan a der barê ku bi wan re bi zimanê wan ê dayîkê têkilî tê danîn, kêmtir e. Di xebateke ku der barê li Tirkiyeyê di perwerdehiyê de bikaranîna zimanê dayîkê de, hatiye kirin de, daneyên ku malbat ji bo teşwîqkirina axaftina bi Tirkî ya zarokên xwe, di nav malê de bi wan re bi Tirkî diaxivin, hatine dîtin [Coşkun, Derince, Uçarlal û Yarası, 2010]. Daneyên ku di vê lêkolînê de hatine bidestxistin, bi wan daneyan re lihev kirî dixuyên. Ji ber ku zimanê perwerdehiyê Tirkî ye, dibe ku malbat li serkeftina zarokên xwe ya di perwerdehiyê de difikirin û ji ber wê yekê hewl didin, ku bi wan re bi Tirkî biaxivin.

Heta niha cudahiya navbera daneyên têkildarî bikaranîna zimanê dayîkê ya herî mezin, di pirsên têkildarî bikaranîna zimanê dayîkê ya li kuçeyê û di jiyana civakî [qada giştî] de hat dîtin. Her çiqas di mijara bikaranîna zimanê dayîkê de di navbera zarok û dayîk û baban de cudahiyeke berbiçav hatibe dîtin ji, ji pirsên heta niha diyar dibe, ku di nav malê de bi piranî zimanê dayîkê tê bikaranîn. %58,8ê zarokan gotin, ku li kuçeyê/di dema liştinê de bi Tirkî diaxivin û ev rêje ji bo zarokên keçin %76 e. %91,4ê zarokên ku li navendên bajaran dijîn, gotin, li kuçeyê/di dema liştinê de bi Tirkî diaxivin. Lê ev cudahî ji bo beşdarên dayîk û bav derneketiye holê. Dayîk û bavan gotin, ku li kuçeyê/di jiyana civakî de bi piranî bi zimanê xwe yê dayîkê têkiliyê datînin. Wek sedema ku zarok li kuçeyê/di dema liştinê de ji zimanê xwe yê dayîkê zêdetir bi Tirkî diaxivin, bikaranîna zimanê fermî ya di sazî û dezgehên perwerdehiyê de tê fikirîn. Ji ber ku li Tirkiyeyê zimanê fermî Tirkî ye û di pergala perwerdehiyê de Tirkî tê bikaranîn, zarok ji li dibistanê û bi hevalên xwe yên dibistanê re li kuçeyê bi piranî bi Tirkî diaxivin. Ev rewş dikare wek hêmaneke girîng bê nirxandin.

3.2.3. Perwerdehiya Bi Zimanê Dayîkê

Beşa sêyemîn a daneyên lêkolînê ji mijara perwerdehiya bi zimanê dayîkê pêk tê. Ku li daneyên têkildarî pirsê, ka zarok perwerdehiya bi zimanê xwe yê dayîkê dixwazin an na, bê nihêrtin, ji derveyî zarokên koma temenê navbera 6 û 9 saliyê tê dîtin ku bi rêjeya %65'an dixwazin. Li gor komên din kêmbûna daxwaza wergirtina perwerdehiya bi zimanê dayîkê ya koma temenê navbera 6 û 9 saliyê, têkildarî biçûkbûna temenê wan û ji ber wê yekê pêknehatina pêzanîna wan

a der barê perwerdehiya zimanê dayîkê de, hat nîrxandin. Wek bersiva pîrsa, ji bo perwerdehiya bi zimanê dayîkê daxwazeke we heye yan na, %70'yê dayîk û bavan gotin, ku daxwazeke wan a bi vî rengî heye. Dijberî van daneyan, hat dîtin, ku rêjeya zarokên ku li dibistanê zimanê xwe yê dayîkê wek dîrsa hîlbijartî hîlbijartine yan jî pêşniyaz kirine, pîr hindik e. Dema ku ji van zarokên ku daxwaz û motîvasyona wan a zimanê dayîkê zêde hat dîtin, hat pîrsîn, ku çima zimanê xwe yê dayîkê wek dîrsa hîlbijartî hîlbijartine, gotin, ku vebijêrkeke bi vî rengî nedane ber wan.

Wek ku tê zanîn dîrsa "Ziman û Zaravayên Ku Dijîn" di serdema perwerdehiyê ya 2012 û 2013'an de wek dîrsa hîlbijartî di mufredatê de hatiye bicihkirin. Ji bo ku ev ders bê dayîn pîvana ku divê deh xwendekar hîlbijêrin, hatiye danîn. Lê weke ku dê ji lêkolînên ku hatine kirin (Memduhoğlu û Mazlum, 2013) û nûçeyên têkildarî mijarê bê fêmkirin rêjeya dayîna van dîrsan hindik e, tevî ku zarok vê dersê hîlbijêrin jî, ji bo ku ders bê dayîn, însiyatîf a rêveberiyên dibistanan e û bi pîranî jî ber ku mamoste tune ne, ders nayên dayîn. Ji bo ku zarok bikaribin li sazî û dezgehên perwerdehiyê zimanê xwe yê dayîkê hîn bikin û bi pêş bixin, ev sepan tekane derfet e lê tê dîtin, ku bi gelek hincetên cuda nayê pêkanîn.

3.2.4. Girîngiya Zimanê Dayîkê û Parastina Wî

Beşa dawîn a daneyan têkildarî girîngî û parastina zimanê dayîkê ye. Di vê beşê de mijarên wek axaftina bi zimanê dayîkê çima girîng e, zimanê dayîkê çawa dikare bê parastin û xetereyên têkildarî tunebûna zimanê dayîkê çî ne, hatin vekolandin.

Pêşiyê ji beşdaran hat pîrsîn, ku axaftina bi zimanê dayîkê çiqas girîng e. Hat dîtin, ku hem zarok û hem jî dayîk û bav axaftina bi zimanê dayîkê girîng dibînin. Wek bersiva pîrsa, axaftina bi zimanê dayîkê çima girîng e pîraniya zarok, dayîk û bavan gotine, "ji ber ku zimanê me yê dayîkê ye". Ji ber vê yekê hat dîtin ku beşeke girîng a beşdaran, bêtî ku li sedemeke din bigerin, bi tenê ji ber ku zimanê wan ê dayîkê ye, girîngiyê didin axaftina bi vî zimanî. Dayîk û bavan di heman demê de gotin, ku zimanê wan ê dayîkê çand û dîroka wan e.

Têkildarî parastina zimanê dayîkê hat dîtin, ku zarok balê dikişînin ser pêwîstbûna berbelavbûna axaftina bi zimanê dayîkê. Lê derket holê, ku di vê mijarê de fikreke beşeke girîng a zarokan jî tune ye.

Ji bo ku ziman bijîn, ji aliyekî ve girêdayî pêzanîna girîngiya zimanê dayîkê ya ku di temenê biçûk de tê bidestxistin e. Di vê çarçoveyê de hebûna kesên ku haya wan jî girîngiya ziman û dê çawa bê parastinê tune ye, ji bo tunebûna ziman dikare wek xetereyekê bê nîrxandin. Dayîk û bav wek xetereya herî mezin a ku dikare bibe sedema mirîna ziman, neaxaftina bi zimanê dayîkê dibînin. Ji beşdaran hinekan bal kişand ser nebûna perwerdehiya bi zimanê dayîkê û hinekan jî bal kişandin ser pêkutiyên dewletê.

Her xetereya ku hatiye gotin, bi rastî jî di nav xetereyên ku dibin sedema mirîna zimanan de cih digirin. Polîtîkayên dewletan, nedayîna derfeta perwerdehiya bi zimanê dayîkê, di nav hêmanên girîng ên ku dibin sedema tunebûna zimanan de cih digirin.

Yek ji nîşaneyên herî girîng ên têkildarî mirîna zimanan jî komên temen ên ku ziman bi awayekî çalak bi kar tînin in. Ji zarokan hat pîrsîn, ku endamên malbatê yên di temenê cuda de di nav malê de çiqasî bi zimanê xwe yê dayîkê diaxivin û serî li çavdêriyên zarokan hat dayîn. Bersivên ku hatin dayîn, bi awayekî aşkere nîşan didin, ku her temen biçûk dibe, meyla bikaranîna zimanê

13- <https://www.evrensel.net/haber/374106/21-subat-dunya-anadili-gunu-anadilinde-egitim-neden-onemli>

14- <https://bianet.org/bianet/egitim/240426-meb-kurtceye-sadece-3-kontenjan-ayirdi>



dayîkê jî kêr dibe. Mirov dikare bibêje ku gelek hêmanên civakî û teknolojik ên ku bandorê li vê encamê dikin, hene. Mirov dikare sedemên wek di perwerdehiyê de fermibûna zimanê Tirkî, li gor nîfşên temen mezin bi awayekî çalakîr beşdarbûna nîfşên nû ya pergala perwerdehiyê, bitîrkîbûna alav û amûrên medyayê yê dîtarî û nivîskî, zêdetir bikaranîna van alav û amûran a nîfşên ku bi xwendin û nivîsandina Tirkî dizanin, bihejmêre. Divê veguherînên wek ketina televîzyonê ya jiyana me, zêdebûna çûyîn û hatina bajarên an jî bi tevahî niştecihbûna li bajarên jî neyên jîbîrkirin.

Di xebateke ku têkildarî veguherîna zaravayê Zazakî ya li gor nîfşan hevdiîtinên çawaniyê hatine pêkanîn de (Meşe, 2019) vegotinên jî beşdarên yekî yê têkildarî mijarê wîhan in: "Diya min dihat. Jixwe kal û pîran jî televîzyonê hez nedikir. Digotin sazê şeytan e. Dijberî wan me jî pir jê hez dikir. Ku em piçekî hînî Tirkî bûn, bi saya televîzyonê ye. Lê bi saya televîzyonê zarokên min baştir bi Tirkî dizanin." Wek ku dê bê texmînkirin, beşdarî û adaptasyona nîfşên ciwan a hemû veguherînên jiyane, ku bi ya mezinan re bê rûberîhevkirin, zêdetir û lezgintir e. Ev rewş jî bandorê li bikaranîna zimanê dayîkê dike.

4. Di Şûna Encamê De

Komên ku zimanê wan ê dayîkê Zazakî ye, karibûne li wargehên xwe yê heq û di nav avaniya civaka xwe de zimanê xwe li gor pêdiviyên xwe bi pêş bixin û heta îro bin. Tê zanîn, ku li gel veguherînên pir mezin ên sedsala dawîn, ên ku bi Zaravaya Zazakî diaxivin, bi rêjeyê girîng jî gundan ber bi bajarên ve koç kirine. Zazakiya ku li wargehên xwe dikaribû hemû pêdiviyên civaka xwe pêk bîne, li hemerî vê veguherîna pir lezgîn a ku bi koçkirina ber bi bajarên ve dest pê kir, di xweguherandinê de gelekî dijwarî jiya. Zimanekî ku tu statuyeke wî ya fermî tune be û bi ser de jî bi awayekî pir zêde dûçarî politikayên bişaftinê bibe, ne pêkan e ku li hemerî veguherîneke ew qas lezgîn a civakî zimanek xwe biguherîne û adapte bike. Ji ber vê yekê îro Zazakî jî civaknasiyê bigire heta siyasî û aboriyê, jî hunerê bigire heta zanistên civakî, jî hiqûqê bigire heta perwerdehiyê di gelek qadan de jî terînolojiyêke pêwîst bepar e. Di van salên dawîn de her çiqas di qadên wek perwerdehî, huner û rêveberiyên xwecihî de bi hewla pêkanîna terînolojiya pêwîst hinek xebat hatibin kirin jî, bêtir ku pêşkêşîneke tê xwestin derkeve holê, li şaredariyan qayûm hatin peywidarkirin, piraniya sazî û dezgehên wek komele, enstîtu, weqf û hwd. hatin girtin û xebatê bê encam man.

Yek ji qadên ku asta bikaranîna ziman bi awayekî herî zelal tê de dixuyê, aborî ye. Zimanê ku li bazarê tê bikaranîn, derbarê zimanê serdest ê wê civakê de daneyên girîng dide me. Ji derveyî hinek navçeyên biçûk ên ku bi tenê kesên Zazakîxêv lê dijîn, em nikarin bibêjin ku zimanê bazarê Zazakî ye. Li bajarên wek Amedê yê ku axêverên zaravayên Kurdîyê Zazakî û Kurmancî bi hev re dijîn bi xwe jî zimanê bazarê Tirkî ye.

Ji derveyî van pîvanên ku me behsa wan kir, wek ku tê zanîn, em di serdemeke teknolojiyê de ne. Mirov piraniya dema xwe bi alav û amûrên teknolojik derbas dikin, kar û barên xwe bi, van alav û amûran dikin. Lê ji van alav û amûrên ku ew qas zêde tîn bikaranîn û bûne perçeyekî jiyana rojane yê bivê ne, hema bibêje tu yek jî piştgiriya zimanî ya bi Zazakî nade. Wek mînak di tu platformên medyaya civakî yê wek Facebook, Instagram û Twitterê yê ku pir zêde tîn bikaranîn de piştgiriya zimanî ya bi Zazakî tune. Yek ji derfetên ku dibe sîdewer be, hilberandina naverokên bi Zazakî ye ango di vî qadê de hebûna Zazakî ye. Platformên medyaya civakî yê wek Twitter, Facebook û blogan jî bo kesên ku dixwazin bi Zazakî binivîsin û bixwînin, xizmete wek vekirina qadê pêşkêş dikin.

Ji bo ku zimanek hebûna xwe bidomîne û bijî, yek ji piştgiriyên herî girîng jî, di qada giştî de bikaranîna wî zimanî ye Lê li Tirkiyeyê tu xizmeteke giştî bi Zazakî nayê pêşkêşkirin. Li wargehên ku hema bibêje tevahiya şênîyên wan bi Zazakî diaxivin jî xizmetên giştî bi Tirkî tîn pêşkêşkirin.

Ji aliyê encamên vê lêkolînê ve û di çarçoveya lîteratura ku xwegihandin pêkan bûye de, yek ji xalên herî girîng ên ku divê bal bê kişandin, ew e, ku di jiyana rojane de bikaranîna ziman hêdî hêdî kêmtir dibe. Ji derveyî gundên li qadên çiyayî yên ku wek gundên çiyê tîn binavkirin, hema bibêje li hemû navendên din zarok di jiyana rojane de Zazakî pir hindik bi kar tînin. Bi taybetî li navendên bajar/navçeyan û li jîngehên nêzî wan navendan, kesên ku zimanê wan ê dayîkê Zazakî ye, bi piranî bi Tirkî, piştî wê bi zaravaya Kurdiyê Kurmancî û piştî wê jî bi Zazakî diaxivin. Tê dîtin ku di pêvajoya perwerdehiyê û qadên giştî de Tirkî, di têkiliyên bazirganiyê de jî zaravaya Kurdiyê Kurmancî dane pêş.

Li gel vê yekê jî beşeke pir zêde ya şênîyên gundên ku em çûnê, gotin, li gor baweriya wan divê bi ziman bê axaftin û ziman bê parastin û têkildarî vê mijarê gotin, ku li navendên ew lê dijîn, hebûna derfeta kursên ziman, ji bo bikaranîn û pêşketina ziman girîng e. Piraniya beşdarên ku bi wan re hev dîtin hat kirin, gotin, ku nebûna perwerdehiya bi zimanê dayîkê yek ji astengiyên herî mezin ên li pêşiya pêşketina ziman e. Hat dîtin, ku zarokên di temenê dibistanê de yên ku li gundên qadên çiyayî dijîn, beriya ku biçin dibistanê, bi Zazakî diaxivin lê di pêvajoya perwerdehiyê de "hema bibêje" Zazakî ji bîr dîkin û têkiliyên xwe bi Tirkî datînin.

Li gor encamên qadî, xwedîderketina li ziman, ji helwesteke bîrdozî wêdetir wek ragihandina çand û dîrokê tê dîtin. Li qadên ku lêkolîn lê hat kirin, hinek caran helwest û nîrxandinên siyasî yên dijberî hev hatibin dîtin jî, hat dîtin, ku di mijara axaftina bi ziman û parastina ziman de yekîtiyeke ramanî heye. Li cihên wek Ezirgan, Dêrsim û Gumgumê yên ku piraniya şênîyên wan Elewî ne, ziman wek navgîneke ragihandina baweriyê jî tê dîtin. Li herêmên din jî baweriya ku dê çand û dîrok herî baş bi zimanê dayîkê bikaribe bê ragihandin, pir xurt e.

Wek xala dawîn, beşdarên bi awayekî zelal danîn holê, wek hêmaneke folklorîk û çandî nihêrtina li zimanê dayîkê jî girîng e lê ji bo ku zimanek bikaribe hebûna xwe bidomîne, di serî de divê xwedîyê statuyê fermî be û bibe zimanê perwerdehiyê. Li gor çavdêriyên me yên li qadê, baweriya ku di rewşa ziman de destwerdan pêk nayê, kêmtir zêde dê di 50 salan de kesên ku bi Zazakî diaxivin, nemînin an jî dê bikeve rewşa zimanekî ku li herêmên pir teng ên diyar ji aliyê hejmareke hindik mirovan ve tê axaftin, baweriyê serdest e.

Ku mirov bi kinasî cih bide çîroka zimanê Galî yê ku di beşa zimanên newele de bû û karibû bikeve nav zimanên ewle;

Zimanê Galî yê ku di pêvajoya dîrokî de li Îrlanda, Îskoçya û Gallera îroyîn dihat axaftin, ji aliyê dewleta Îngilîzan ve demekê bi hincetên cuda li dibistanan hatiye qedexekirin (1872) û ji wê rojê ve her ku çûye bikaranîna zimanê Galî ya di qada giştî de kêmtir bûye û bi xetereya tunebûnê re rû bi rû maye. Her çiqas di her serdemê de rewşenbîrên ku li hemberî tunebûna ziman têkoşiyane, hebûne jî di salên 1970'yî de zimanê Galî çî ji ber politîkayên Îngiltereyê çî ji ber ku di qada civakî û aborî de nebûna dahatake wî, pêvajoya bişafînê jiyaye. Beşa çîrokê ya ji vir û şûn de ji bo têgihiştina me ya zimanekî ku bi mirinê re rû bi rû hatiye hiştin, çawa dikare ji nû ve bê vejandin, pir girîng e. Di sedsala 20'emîn de bi awayekî giştî di nav civaka Galî de hewlên ji bo domandina hebûna zimanê Galî hebûne. Lê di salên 1990'î de van hewlan rengê civakî wergirtine û veguherûne bernameyekê. Di salên 1993 û 1998'an de ji bo ku di qada giştî de zimanê Galî bi awayekî wekhev bê bikaranîn, hikûmetê sererastkirinên zagonî yên cuda pêk anîne. Li



gel sererastkirinên zagonî, têkildarî dahatûya zimanê Galî pêşnûmayek hatiye amadekirin û ji bo nêrîna gel hatiye pêşkêşkirin, bi beşdariya civakê ya çalak di encama nîqaş û danûstendinên ramanî yên ku bi mehan domiyan de "Bernameya Zimanê Galî" hatiye amadekirin. Ji bo ku ev bername bê sepanandin "Lijneya Zimanê Galî" hatiye avakirin. Di sala 1997'an de bi damezirandina "Meclîsa Neteweyî Ya Galiyan" re binbaryên têkildarî zimanê Galî li gel qada giştî li qadên taybet jî hatine ferzkirin. 7ê Berfanbara 2010'an de Meclîsa Galiyan ji bo pêşketina ziman rêzek bergirtin bi yekdemî pejiirandîye, biryarên ku hatine wergirtin, ji bo erêkirina keyaniyê hatine pêşkêşkirin û hatine erêkirin û bi wî awayî zimanê Galî li beşeke Îngiltereyê bi awayekî hiqûqî bûye zimanê fermî. Li gel van sepanan hemûyan, yek ji gavên girîng ên ku ji bo hebûna zimanê Galî hatine avêtin, heta 16 saliyê li dibistanan kirina zimanê mecbûrî ya Galî ye. Ya rast beriya salên 2000'î Galî li dibistanan ji xwe re cih didît lê wek dersên hinkirina Galî yên bi qasî çend saetan bû. Piştî salên 2000'î perwerdehiya bi zimanê Galî dest pê kiriye. Hêza herî girîng a ku Galî ji mirinê rizgar kiriye, derbasbûna pergala perwerdehiyê ya bi wî zimanî ye. Di encama van pêvajoyên ku hatine jişandin, zimanê Galî iro wek zimanekî zindî û çalak xurt dibe û hebûna xwe didomîne.

Mixabin çarenûsa hemû zimanên ku bi tunebûnê re rû bi rû mane, wek ya zimanê Galî nebûye. Li cihanê di van sê nîfşên dawîn de bi mirina nûnerên zimanên ku pir tîr axaftin re 200 ziman tune bûne. Li gor Atlasa ku UNESCO'yê weşandiye li Tirkîyeyê sê ziman wenda bûne. Yewnankiya Kapadokyayê li cihanê zimanekî ku herî zêde li ber tunebûnê ye. Zimanê Mlahso yê ku li gundê Mela yê Licêya Amedê hatiye axaftin, yek ji zimanên ku tune bûye ye. Bi mirina İbrahim Hanna yê ku koçî Sûriyeyê kiriye ya di sala 1995'an de, ev ziman jî miriye. Ubihkî jî di sala 1992'yan de bi mirina Tefvîk Esenç tune bûye.

Ku mirov li gor zimanê Galî û van sê zimanên ku van salên dawîn li Tirkîyeyê mirine, rewşê binirxîne, pirseke pir girîng tê hişê mirov: Gelo zimanek çawa dikare ji tunebûnê bê parastin?

Bersiva vê pirsê di rêbera UNESCO'yê de ye:

"Ji bo ku zimanek ji tunebûnê bê parastin, tiştê herî girîng ê ku divê bê kirin, afirandina derfetên guncav ên ku mirov bikaribin bi wî zimanî bi axivîn û hînî zarokên xwe bikin e. Ji bo vê yekê jî bi piranî divê politikayên neteweyî yên ku zimanên kêmarîyan nas dikin û diparêzin, pergala perwerdehiyê yên ku piştgiriya bidin zimanê dayikê, di navbera komên ku bi wî zimanî di axivîn û zimannasan de ji bo pergala nivîsê û pêkanîna avaniyeke teşeyî hevkarîyeke afirîner hebin. Ji ber ku hêmana herî diyarker helwesta axêverên ziman a li hemberî wî zimanî ye, divê rewşeke siyasî û civakî ya ku ji bo pîrziyaniyê û rêzdariya li hemberî zimanên kêmarîyan wêrekiyê dide, bide hîskirin ku axaftina bi zimanekî ne peywir lê dewlemendiyek e, bê pêkanî. Ev esas e."

Zazakî her çiqas zimanekî kevnare û qedîm be jî, bikaranîna di qada giştî de roj bi roj kêmtir dibe. Bi politikayên îroyîn û xebatên ziman ên ku li gel van politikayan jî tîr meşandin, ne pêkan e ku pêşîya vê tunebûnê bê girtin. A niha gelek xebatên ku li ser Zazakî tîr kirin, bi hewlên takekesî dimeşin. Pir zehmet e, ku mirov bibêje, politikayeke hevpar a axêverên Zazakî ya li dijî

16- https://en.wikipedia.org/wiki/Welsh_language

17- <https://tr.wikipedia.org/wiki/Ub%C4%B1n%C3%A7a>

18- [https://bianet.org/bianet/bilim/112702-unesco-turkiye-de-15-dil-tehlikede#:~:text=Kesinlikle%20tehlikede%20olanlar%3A%20Abazaca%2C%20Hem%C5%9Fince,ba%C5%9Fka%20%C3%BCkelere%20gitti\)%20ve%20Ermenice](https://bianet.org/bianet/bilim/112702-unesco-turkiye-de-15-dil-tehlikede#:~:text=Kesinlikle%20tehlikede%20olanlar%3A%20Abazaca%2C%20Hem%C5%9Fince,ba%C5%9Fka%20%C3%BCkelere%20gitti)%20ve%20Ermenice)

bişavtinê heye. Yê ku bi vê zaravayê diaxivin, divê wek civakekê bi saziyên xwe re di çarçoveya bernameyeke hevpar de têbikoşin. Bi taybetî Zazakî lê divê bi giştî qedexeyên li ser hemû çand û zimanan bên rakirin, ji bo ku li ser vê axê bi awayekî azad bijîn û bi pêş bikevin, divê şert û mercên guncav bên afirandin. Gelek xebat ji bo pêşilêgirtina tunebûna zimanan pêşniyazên hevpar dikin.

5. Pêşniyaz

- Divê di hemû peymanên ku Tîrkiye alîgir e de dûreparêziyên têkildarî mafên zimanê dayikê bên rakirin.
- Ji bo ku di qada giştî de pêşî li bikaranîna Zazakî bê vekirin, divê di asta destûra bingehîn de veguherîn bên pêkanîn.
- Divê Tîrkiye bibe aligira peymanên navneteweyî yên ku mafê zimanê dayikê diparêzin ên wek Peymana Zimanên Herêmî û Kêmariyan a Ewropayê, Peymana UNESCO'yê ya Li Dijî Cudakariya Di Perwerdehiyê De û Peymana Çarçoveyî ya Parastina Kêmariyên Neteweyî ya Konseya Ewropayê yên ku heta niha nabûye alîgir
- Divê çavdêriyên encamê yên Komîteya Mafên Zarokan a NY'yê li ber çavan bên girtin, di nûsafên welatan de agahiyên ku Komîte dixwaze bên dayîn, nûsaf û çavdêriyên encamê li Zazakî bên wergerandin û belavkirin.
- Ji bo ku zarok li malê dest bi hînkirina zimanê xwe yê dayikê bikin, divê piştgiriya dayik û bavan bê kirin.
- Divê di mijarên wek dayîna dersa hîlbijartî ya Ziman û Zaravayên Ku Dijîn, pêvajoya hîlbijartina zarokan û peywirdarkirina mamosteyan de gavên şên ber bên avêtin.
- Li herêmen ku bi piranî axêverên zaravaya Zazakî lê dijîn, divê mamosteyên duzimanî yên ku bi Zazakî dizanin bên peywirdarkirin.
- Divê dibistanên taybet ên ku perwerdehiya bi Zazakî bidin bên teşwîqkirin.
- Ji bo ku berhemên medyaya dîtbarî û nivîskî yên bi Zazakî bên zêdekirin, divê sazî û dezgehên têkildar bên xurtkirin.
- Divê ji bo zarokan çavkaniyên (Kanalên TV'yê, pirtûk, kovar û hwd.) bi Zazakî bên amadekirin.
- Divê di mijara bandora perwerdehiya bi zimanê dayikê ya li ser pêvajoyên pêşketina zarokan de xebatên akademîk bên kirin..
- Divê der barê nêrîn û nêzikahiya zarokan a li hemberî zimanê dayikê de zêdetir xebat bên meşandin û zarok jî beşdarî tevahiya pêvajoyên lêkolînê û xebatên qadî bibin. .



Çavkanî

Çavkaniyên Ku Bi Riya Înternetê Xwegihandin Pêk Hatiye

1. TBMM Anayasa Komisyonu Tutanak Dergisi, 11. Toplantı, 14 Temmuz 2017 https://www.tbmm.gov.tr/develop/owa/komisyon_tutanaklari.goruntule?pTutanakId=1932
2. https://tr.wikipedia.org/wiki/Mehemed_Malm%C3%A4sanij
3. <https://www.evrensel.net/haber/29000/zazak-welat-verroj-cikti>
- 4.
5. <http://www.zazaki.net/haber/newepel-ilk-kirmancca-zazaca-gazete--899.htm>
6. <https://www.gazeteduvar.com.tr/kultur-sanat/2019/12/22/xwebun-yayina-basladi>
7. <https://insanhaklarimerkezi.bilgi.edu.tr/tr/content/117-medeni-ve-siyasi-haklara-iliskin-uluslararası-sozlesme/>
8. <https://www.mevzuat.gov.tr/MevzuatMetin/1.5.2709.pdf>
9. <https://insanhaklarimerkezi.bilgi.edu.tr/tr/content/120-ekonomik-sosyal-ve-kulturel-haklara-iliskin-uluslararası-sozlesme/>
10. <https://www.unicef.org/turkey/%C3%A7ocuk-haklar%C4%B1na-dair-s%C3%B6zle%C5%9Fme>
11. <https://m.bianet.org/bianet/insan-haklari/183823-yasayan-diller-ve-lehceler-dersi-ve-anadilinde-egitim-hakki>
12. <https://bianet.org/bianet/diger/220227-iki-saatlik-zazaca-dersinde-dilimizle-kacamak-bir-ask-yasiyoruz>
13. <https://bianet.org/bianet/diger/220090-kurtce-kurmanci-dersi-kapanir-korkusundan-tayin-bile-isteyemiyoruz>
14. <https://www.evrensel.net/haber/374106/21-subat-dunya-anadili-gunu-anadilinde-egitim-neden-onemli>
15. <https://bianet.org/bianet/egitim/240426-meb-kurtceye-sadece-3-kontenjan-ayirdi>
16. https://en.wikipedia.org/wiki/Welsh_language
17. https://en.wikipedia.org/wiki/Welsh_language
18. <https://tr.wikipedia.org/wiki/Ub%C4%B1h%C3%A7a>
19. <https://bianet.org/bianet/bilim/112702-unesco-turkiye-de-15-dil-tehlikede#:~:text=Kesinlikle%20tehlikede%20olanlar%3A%20Abazaca%2C%20Hem%C5%9Fince,ba%C5%9Fka%20%C3%BCkelere%20gitti%20ve%20Ermenice>

Çavkanîyên Akademîk

- Alay, O. [2020]. Sözellikten Yazılıya: Kirmancca [Zazaca] Sözlü Edebiyatla İlgili İnternal ve Eksternal Araştırmalara Dair Bir Değerlendirme, Kordinatör: Shahab Vali. Yazınsal Varoluştan Akademik Literatüre Kirmancca [Zazaca], İstanbul: Vate Yayınları.
- Can, M. [2018]. Kirmancca [Zazaca] Bibliyografyası (1963-2017). (Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi). Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü
- Can, M. [2020]. Türkiye'de Kirmancca [Zazaca] Üzerine Yazılan Yüksek Lisans Tezlerinin Bibliyometrik Analizi (2013-2020). The Journal of Mesopotamian Studies, 5(Özel), 33-48.
- Coşkun, V., Derince, M. Ş., Uçarlar, N. [2010]. Türkiye'de Eğitimde Anadilinin Kullanılmaması Sorunu ve Kürt Öğrencilerin Deneyimleri. Disa Yayınları, Diyarbakır.
- Evirgen, A. E. Kafkas Dilleri Üzerine Türkiye'de Yapılan Tezler Bibliyografyası. Tehlikedeki Diller Dergisi, 11[18], 183-212.
- Gander, J. M. ve Gardiner, W. H. [2010]. Çocuk ve ergen gelişimi (Dönmez, A., Çelen, N., Onur, B. Çev.). Ankara: İmge Kitabevi. 185-199
- Memduhoğlu, H. B., ve Mazlum, A. G. [2013]. Seçmeli ders uygulamasının sosyal ve pedagojik temelleri ve yansımaları. Kesintili On İki Yıllık Zorunlu Eğitim Modelinde Seçmeli Dersler Sempozyumu, 51.
- Moseley, C. [2012]. The UNESCO atlas of the world's languages in danger: Context and process. World Oral Literature Project.
- Sadoğlu, H. [2002]. Uluslaşma sürecinde Türk dil politikaları (1839-1950).
- Sadoğlu, H. [2017]. Türkiye'nin Yakın Dönem Dil Politikaları. PESA Uluslararası Sosyal Araştırmalar Dergisi, 3(1), 57-66.
- Selcan, Z. [2011, Mayıs]. Zaza Dilinin Tarihi Gelişimi. I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu, Bingöl Üniversitesi Yayınları
- Söylemez, İ. [2011]. Geçmişten Günümüze Zazaca Dergiler: Kronoloji, Sorunlar ve Çözümler. I. Uluslararası Zaza Dili Sempozyumu, 13-14.
- Varol, M. [2015]. Zazaca yazılan eserlere dair bir bibliyografya (1899-2014). Bingöl Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Dergisi, 1(1), 39-54.
- Zilan, B. [2017]. Di Kitabê Muhemmedê Şêx Ensarî: "Raro raşt" û "Me'lumatê Dîniye (Metn û Cigêrayîş). İstanbul: Weşanxaneyê Vateyî





www.giyav.org.tr

Elazığ Cad. Mimar Sinan Mah. Diyar Galeria C Blok Kat:4 No:10 Yenişehir / Diyarbakır
t: (0412) 223 00 90 f: +90 (412) 00 90 e: g.vakfi@gmail.com w: goctvakfi@gmail.com

www.giyav.org.tr